


# Mirîn ji yaneke nû ye

# H

unermend

Behzat Gedro li ser hunera teşkîlî ya kurdî ji me re axivî: Hunera kurdî kare bibe hunera cîhanî jî, lê divê ew ji kurdiya resenî, bête wergirtin û bi awayekî ciwan û nûjen bê wênekirin. Hunera kurdî di çarçoveya netewetiyê de maye. Lê ev jî, ji encama du sedeman pêk hatiye. Yekemîn: Rewşa rêzanî ya ku gelê kurd tê de dijî. Duyemîn: Negatîviya pêwendiyên gelê kurd û tevgera ramiyarî yê bi hunerê re.

Rûpel 8-9



■ Bavê romannivîsê navdar Orhan Kemal, Abdulkadir Kemalî, demekê Serokê Mehkemeya Îstîklalê bû, lê pişt re bû bersûcê wê. İsmail Göldaş li ser vê yekê nivîsî.

Rûpel 16

■ Gelo ji bo çî Rojnameya Diyarbakır Sözü, Qurana bi kurdî wekî xelat dide xwendevanên xwe. Ji ber ku ji kurdan hez dike, lewma? Rahmi Batur bi nivîsa xwe bal dikişîne vê rewşê.

Rûpel 6

■ Dergûşa olan Mezopotamya, nivîskarê me Altan Tan bi vî sernavî rewşa vê devera kewnare ya do û îro bi bîr dixê û wan dide ber hev.

Rûpel 7

NAVEROK



4

Nimûneyek ji dengbêjiya nûjen



11

Gulên Mezrabotan ji bo aştiye deng li dine dikin



6

NÇM Li Stenbolê cihekî dinê jî vedike.

Ji xwendevanan

Ez dixwazim bibêjim, derketina Azadiya Welat li me hemûyan pîroz be. Li hemû kesên xwenas û Welatparêz; li hemû têkoşerên di girtîgehên de, ewên ku bi berxwedanên xwe yê nî ruwet serfirazî û serbilindiya gel in.

Lê belê gelî xwendevanên delal, gelî welatparêzên ezîz, gerek e ji îro şûn de em li rojnameya xwe ya nû Azadiya Welat, xwedî derkevin, bistînin, bidin xwendin. Gelî heval û hogirên delal, hûn dizanin ku rojname û kovarên me bi destê zorê hatin qedexekirin, bi dehan nivîskarên şoreşger hatin şehîdkirin. Ji ber vê divê em li weşanên xwe xwedî derkevin.

APOCAN  
PENDİK/STENBOL

EM bi hev re bikevin bin barê Azadiya Welat

98 saliya rojnamegeriya qedexe, li xeribî û biyanîyê, bêhma li ber çikan-dinê bi darê zora dūgelan...

Welat, Welatê Me, îro jî Azadiya Welat. Va ye, oldar û şoreşvan mil dane hev ji bo Azadiya Welat, ji bo ku temenê wê nebe kin wekî yê Komara Mehabadê, bang li hemû gelê me, bi hev re em xwe bidin bin barê Azadiya Welat.

BEKIRHAN YILDIZ  
AMED

WELAT

Roja 28'ê rêbendanê li Otela The Marmarayê, konferansêk pêk hat. Ji derdorên cihê cihê gelek sazî, rêxistin û kes li Stenbolê li hev civîn. Tevan jî, ji bo ku kêliyêk herî kêliyêkê rişîna xwînê bisekinê û aştiyêke birûmet pêk were, dixwestin çalakiyên civakî bêne li darxistin. Belê, sosyalîstan jî, demokratan jî, welatparêzan jî, hawirparêzan jî û derdorên îslamî yê dijber jî, ev yek dixwestin.

Biryarên berbiçav jî hatin standin. Civîna bi navê "Ji bo aştiyê em bêne cem hev" rewşeke girîng derxiste holê. Aştîxwaz êdî ji berê bêhtir dixwazin dengên xwe bilind bikin û bergeha têkoşîna xwe fireh bikin.

Lê astengeke girîng li pêşiya vê tevgera aştiyê heye. Ew jî çepera li dora wan e. "Medyaya şerxwaz" eleqe nişanî vê yekê

neda. Ne êvarê televizyonan di bernameyên xwe yê nûçeyan de cih dan vê çalakiyê û ne jî dotira rojê çapemeniya nivîskî. Ew, bi derxistina "krîza Egeyê" re mijûl bûn. Di cihê ku nûçevanî bikirana de, şervanî dikirin. Her çiqas ev yek bi destê "rojnamevanan" qewimibe jî, musebîb hêzên serdest û serwar in. Ji lew re, ew vê wêrekîyê didine wan û zemîne ji wan re amade dikin. Em bi hêsanî dikarin bibêjin ku ew ne rojnamevan bûn; ew leşkerên di qiyafetên rojnamevanan de bûn. Ji aliyê din ve, hêzên îktîdarê yê her du dewletan bi zanebûn ev "krîz" derxistin. pêdiviya wan pê hebû.

Belê, ev hêzên serwer, şerxwaz in û çeperê li dora aştîxwazan teng dikin. Ji ber ku dahata (hesîlata) wan ji vê sazûman û pergalê tê. Hebûna wan, jîna wan bi vê rewşê

ve girêdahî ye. Ew, xwe bi xwîn û bi kuştînan têr dikin. Lobiyên şer, der û dorên ku qaçaxiya esrar, eroîn, morfîn, çekan û hwd dikin, bi vê îktîdarê xwe xwedî dikin. Bi wê re dijîn. Tevî hev dikin û tevî hev dixwînin.

Heke şikandina çeperê bê xwestin, divê serê pêşîn derfet û îmkânên van derdoran jî destê wan bê standin. Gerek e raya giştî bi afirandin; ew "raya piştî" ya heyî, li gorî berjewendî û feydeyên hêzên serdest hatiyê afirandin. Îro hemû navgînan ragihandin yê girseyî û cemaferî, ku bandorê li hikariya wan li ser gel zehf e, gerek e neyê jibîrkirin. Di dawiyê de ev dikare bê gotin. Pêwîst e "tevgera aştîxwaz" xwe ji vê çeperê rîkirîbûnê bifilîtîne û çeperê li wan dorhêlê "şerxwaz" teng bike.

MEHMET GEMSI

# Aştî û agirbest tê munaqesekirin

**Agirbesta yekalî bandora xwe li Tirkiyeyê jî nişan dide. Derdorên aştîxwaz dest bi hinek çalakiyan dikin. Konferansa 28'ê rêbendanê bû destpêka wan çalakiyan. Wisa xuya ye ku wê aştîwaz di rojên pêş de bi çalakiyên cur bi cur çeper li şerxwazan teng bikin.**

Roja 28'ê berfanbarê li salona Konferansê ya The Marmarayê bi pêşengiya derdorên demokratîk konferansêke aştiyê li dar ket. Konferansê serê sibehê di katjimêr 10:00'an de dest pê kir û ji bilî navbera firavîne, heta 17:00'yê êvarê dewam kir. Di konferansê de nûnerên gelek saziyan û gelek kesên aştîxwaz beşdar bûn. Di nav saziyên ku beşdar bûn de, İHD, İnsiyatifa Aştîyê, Mazlum-Der, HADEP, ÖDP, SİP, DİSK, KESK, Komeleya Çand û Piştigiriyê ya Dêrsimiyân, Platforma Demokrasiyê ya Amedê, Komeleyên Çandê ya Pîr Sultan Abdal, TOHAV û Enstîtûya Kurdî hebûn. Tevî nûnerên wan saziyan, gelek kesên mîna Mahir Kaynak, Münir Ceylan, Altan Tan, Şanar Yurdatapan, Metin Metiner, Hasip Kaplan û Koray Düzgören jî bi axaftî-



Münir Ceylan



Fikret Başkaya



Mahir Kaynak

nên xwe beşdarî konferansê bûn. Her wiha kesên wekî mebûsên kurd Hatip Dicle, Leyla Zana, Orhan Doğan, Selim Sadak û A. Melik Fırat, İsmail Beşikçi, Cem Özdemir, Claudia Roth, Cem Boyner, Sertaç Bucak jî bi mesajan dengê xwe gihandin konferansê. Mesajên ku İsmail Beşikçi û mebûsên kurd şandibûn, gelek pêşnizarên li ser aştiyê jî, di nava xwe de dihawandin. Divê bê gotin ku hinek kesên mîna İsmail Nacar, Doğu Ergil û Cem Boyner jî dabûn zanîn ku ji ber karên wan ên din nikaribûne beşdarî konferansê bibin. Di nav kesên ku konferans îdare dikir de Gerîndeya Weşanê ya Yeni Politikayê Leyla Peköz û Muzîkvan Şanar Yurdatapan hebûn.

Şanar Yurdatapan di destpêka civîne de mebesta konferansê, wekî avakirina yekitiya inîsiyatîfên aştiyê û bi vî awayî jî gurkirina dengê aştiyê hate diyarkirin. Wî got: "Me dixwest konferans bi axaftina Yaşar Kemal vebe, lê me nikaribû xwe bigihanda wî." Piştî vê gotinê, wî ji nivîsa Yaşar Kemal ya di Der Spiegel de hatibû weşandin, parçeyek xwend.

**Piştigiriya raya giştî pêwîst e**

Axaftina yekemîn Serokê İHD Akin Birdal kir. Birdal aştî wekî pêviyê jênager bi nav kir û da zanîn PKK'ê di 15'ê berfanbarê de agirbest îlan kiriye. Serokê İHD'ê bi bîr xist PKK'ê di sala 1993'yan de jî agirbest îlan kiribû û li gorî çavderiyên heyî ku ew jî di nav de bûye, PKK bi agirbesta xwe ve girêdayî maye. Birdal got: "Lê hêzên dewletê wê demê gerîla kuştin, 49 gund vala kirin." Serokê İHD da zanîn ku ji wê çaxê bi vî 12.866 kes hatine kuştin. Birdal xwaz ku ev derfeta nû jî, ji dest neçe û agirbest muhatabê xwe bibîne. Wî di dawiyê de axaftina xwe de gelek pêşnizarên bo pêkhatina aştiyê û çareseriyê di kurdî pêşkêş kirin.

Dû re li ser navê heyeteke sendîkayê ya karkeran DİSK'ê Sekreterê G. Mehmet Atay derket ser kursiyê. Axaftina xwest ku aştîxwaz derkevin kolarên Piştî Atay, Serokê ÖDP'ê Ufuk A. Axivî. Aras, rewşa dewletê bi gotinê Platon a ku dibêje 'ji bo keriyê peza tera herî mezin ev e ku segên notir



**ENSTÎTUYA** Kurdî ya Stenbolê li Otêla Hiltonê di 4'ê Reşemiyê de bi navê 'Pirsgireka Kurdan û Çareserîya Demokratîk' konferansê li dar dixe. Di konferansê de wê kesên mîna; Serokê Komelaya Mafên Mirova Akın Birdal, Serokê Komîteya Aştî û Biratiyê İsmail Nacar, Mebûsê RP'yê Bahri Zengin, Serokê DİSK'ê Rıdvan Budak, Cîgirê Serokê HADEP'ê Osman Özçelik, Prof. Mahir Kaynak, Prof. Doğu Ergil, Mebûsê CHP'ê Ercan Karakaş, Serokê Enstîtûyê Şefik Beyaz, Rojnemevan Ragıp Duran wê li ser agirbista PKK'ê, doza kurdan û demokrasiya li Tirkiyeyê biaxifin.



**MEMOSTEYÊN** Fakulteya Ragihandinê ya Zanistgeha Enqereyê roja 30'ê reşemiyê bi gîlînameyekê serî li Konseya Çapemeniyê dan. Memosta didin zanin ku çapemeniyê di bûyera Kardakê de fitnekariya şer kiriye. Dîsa tê gotin çapemenî peywira xwe nayine cih, serateyên çapemeniyê dide bin piyan. Li gorî gotina memosteyan çapemenî li ser bûyeran lêkolînê nake, handana şer û şidetê dike. Wekî tê zanîn rojnamegerên ji Hürriyetê li ser giravoka Kardakê ala tirkan daçikandibû, ev jî bûbû sedema krîzeke. Fitnekariya çapemeniya tirk di warê şerê li Kurdistanê de zelaltir diyar dibe.

## NÛÇE

êrişî wan bikin" şîrove kir. Serokê ÖDP'ê, ji bo aştiyê pêwistiya piştgiriya raya giştî anî ziman. Wî, mebûsên ku hatine hilbijartin, wekî muhatab nîşan da.

Li hêla din Serokê HADEP'ê da zanîn ku doza kurdî bûye meseleyeke navneteweyî. Bozlak got: "Ev mesele hey wê çareser bibe, lê em dixwazin bi destê insanên me çareser bibe." Pişt re jî pêşnizarên xwe yên ji bo aştiyê pêşkêş kirin.

### Tevî agirbestê jî pêkutî didome

Ibrahim Korkmaz, ê ku nûmerê yekane yê rêxistineke ji derve yê TÜDAY'ê bû, (Piştgiriya ji bo Demokrasi û Mafên Mirovan li Tirkiyeyê), diyar ku aştî ji kurd û tirkên li derve jî pêwist e. Ji axaftkaran Serokê Petrol-ış yê berê Münir Ceylan, PKK wekî muhatab nîşan da. Ceylan li ser çareserîya doza kurdî jî got: "Çawa ku em hurmetê nîşanî nasnameya tirkan didin, divê ew jî hurmetê nîşanî nasnameya me bidin." Li ser navê Platforma Demokrasiyê ya Amedê ku ji 29 rêxistinên pêk hatiye, Ali Ülküt derkete ser kursiyê. Ülküt da zanîn ku bandora şer bi taybetî li warê ku şer lê diqewime, mirov baştir kare his bike. Ülküt da eşkerekirin ku tevî agirbestê jî, pest û pêkûtiya dewletê ya li ser gel dewam dike.

Axaftina Serokê SİP'ê Aydemir Güler bal kişand ser aliyê din ê meseleyê. Güler diyar ku 'Aştîya Amerîkayê' birînên gelên bindest derman nake. Güler got: "Rast e, nîvê butçeyê li şer diçe, lê nîvê din jî diçe ji mijokvanan re û divê aştxwaz li vê jî bisekinin." Dîsa Serokê federasyona karmendan KESK'ê Siyamî Erdem da zanîn ku 4.2 katrilyon li şer çûye. Erdem jî bal kişand ser pêwistiya piştgiriya raya giştî.

### Koledariya îdeolojîk divê ji holê bê rakirin

Li aliyê din zanyarê navdar Fikret Başkaya got ku li Tirkiyeyê raya giştî nîn e, ji ber vê yekê jî peywira hêzên pêşverû ya sereke şkêrandina bandora îdeolojiya serdest û afirandina raya giştî ye. Li gel vê gotinê, rewşenbîrê kurd Altan Tan da zanîn ku dewlet tevgerên dijber jî manipûle dike û axaftina xwe wiha domand: "Heta ew dewleta ceberût hebe, mesele hel nabin." Altan Tan tewra hinek beşdarên çepgir rexne kir û



Ji ditin û baweriyên cur bi cur mirov ji bo aştiyê hatin ba hev.

xwest ku cudatiyên îdeolojîk û çinayetiye li ber yekitiya aştxwazan nebin as-teng.

Ji axaftvanan Prof. Mahir Kaynak bi ramanên xwe yên cihêreng gelekî bal kişand ser xwe. Kaynak xwest ku kurd daxwazên xwe yên di warê siyasî de zelal bikin. Wî da zanîn ku aştî ne pêkhatina hemû daxwazên aliyekî ye, lê li

lêzimên wî bi destê hêzên dewletê hatine kuştin. Piştî vê axaftinê mesaja İsmail Beşikçi û mebûsên kurd hate xwendin. İsmail Beşikçi di mesaja xwe de diyar dikir ku li Kurdistanê tevkujiyeke nependî û domdar tê meşandin. Piştî ku pêşnizarên mebûsên kurd hate xwendin, Serokê Mazlum-Der'ê İhsan Arslan derket ser kursiyê. Arslan pê-

ber ku zêdetir ew derdor pişt didin şer.

### Divê di nava tevgera aştiyê de pîr-dengî hebe

Di nav axaftvanan de gotina nûnerê Komeleyên Çandê yê Pîr Sultan Abdal (PAKD) Hikmet Yıldırım a bi regê "Em bi kesên şerîatxwaz re nabin yek.", bû sedema reaksiyona pîraniya beşdarên. Bersiva Hikmet Yıldırım ji kurdên alewî hat. Nûnerê Komeleya Çand û Piştgiriya ya Dersimiyên Hasan San, yekitiya berfireh a aştxwazan parast. Di konferansê de tişteki ku dilê aştxwazan germ kir, silava ku Tomris Özden û Emine Dumanê da wan bû. Li aliyê din, Fevzi Yurtsevenê ku ji Geverê hatibû, derket pêşberî aştxwazan. Fevzi Yurtseven da zanîn ku bavê wî tevî 4 gundiyan din ji aliyê hêzên dewletê ve hatiye binçavkirin û ew kes niha winda ne. Yurtseven jî, ji bo diyarbûna aqûbeta bavê xwe saz-kirina heyetekê xwest. Piştî Fevzi Yurtseven, rojnemejer Koray Düzgören axaftinek kir. Düzgören piştî ku pêdiviya aştiyê eşkere kir, hinek pêşnizarên li ser tevgera aştiyê anîn zûnên.

SAMÎ BERBANG

## Pêşniyaz û daxwazên hevpar ên ku ji konferansê derketin Şer aboriya civakê aniye ber topavêtinê; gelek jan xistiye dilê mirovan; ji bo ku dawî li vî şerî bê, çareserîya siyasî pêwist e; divê agirbest bibe dualî; ji bo pêkanîna vê yekê yekitiya tevgera aştiyê pêwist e.

hevkirina her du aliyên e. Prof. Kaynak jî kurdan soza hevkarîya li dijî hêzên derveyî, ji dewletê jî soza nexapandina kurdan xwest. Ji axaftvanan Mehmet Metiner û Osman Tunç pêdiviya pîr-dengiya platforma aştiyê anîn zimên.

Danişîna piştî nîvro bi axaftina lêzimê kesên ku li Banê hatine kuştin, H. Ömer Özdemir dest pê kir. H.Ömer Özdemir tevî hinek delîlan eşkere kir û

wistiya aştiyê diyar kir û kêmbûna renge kes bi bîr xist. Piştî axaftina germ a Mele Silêman ku bi kurdî axivî û pêwistiya yekitiya kurdan anî zimên, mebûsê berê Hasan Mezarıcı axaftinek kir. Mezarıcı xwest ku li dijî 6 tîrên kemalîstan û sê saziyên wekî MGK, DGM û Mehkemeya Zagona Bingehîn eniyeke redê bê sazkin. Ebûqat Ali Rıza Dizdar jî xwest ku tevgera aştxwaz dengê xwe bigihîne derdorên muhafazakar, ji

# Birawo şerê me giran e

**Me di hejmara xwe ya pêşîn de, cih dabû nivîseke li ser dengbêjîtiyê û nivîs bal dikişande ser rewşa dengbêjan. Îcar R. Dilovan nimûneyeke kilamên dengbêjan peyde kir, lê dide eşkerekirin ku di gel hewlan navê wî kesî hîn nebûye. Naveroka klamê, li ser bûyerên nû ne û bi awayê berê hatiye honandin.**

Dewran e dewran e dewran e...  
 Bira dewran e, wela dewran e  
 , dewrana me kurdan e.  
 Ê hatiye serê kurdan  
 Nehatiye serê mêrikê misilman e  
 Bira şerê me zor e, dawa me giran e...  
 Tev xwişk û birayên kurdan e  
 Temamî wan ji nezara dev reşan  
 Derketine serê daxan û çiyar e...  
 Ji bona Xwedê winê herba xwe bikin  
 Vê sibekê herbeka giran e...  
 Belkî Xwedê emê topraxê xwe derînin  
 Vê sibekê ji bin destê duşman e  
 Eman ji bona xatirê Xwedê û  
 Pexemberan!  
 Menfietê me hemiyar e  
 Dewran e, dewran e, bavo dewran e...  
 Lê dewaran e  
 Lolo biro şerê me zor e, dawa me giran  
 e  
 Ez bala xwe didimê  
 Şerê me ketiye hêla Botan e  
 Dengê top û firoka xwe dane serê  
 çiyar e  
 Terqênê pêşmerga li pêşiya dewleta  
 tirkan e  
 Yê dikujin dikujin, birîndarê wan tene  
 xestan e  
 Ez bala xwe didimê singa xwe dane  
 ber barûd û qurşunan e  
 Ji bona xatirê Xwedê û Pêxemberan!  
 Ji bona me hemiyar e...  
 Erê mala xwe mîrat kiro!  
 Vê sibekê çiyayê Botan  
 Xêla xwe sor kiriye, ji xwîna şehîdan  
 e  
 Li ber xwîna şehîdan şîn bûne gul û  
 çiçek...  
 Bala xwe didime qîrê pêşmerga  
 Wekê qîrê qehremanan diçe ba erşa  
 Xwedan e  
 Dayikê pêşmerga îro singê xwe  
 vekirine  
 Ji bona kul û derdan e...  
 Erê mala we bişewite  
 Nivê pêşmerga bela bûne li gundê  
 kurdan e  
 Şiyar dikin miletê nava ciyan e  
 Dibên kurdo serê xwe rake  
 Ev çi tarîx e, çi zeman e?  
 Ev tarîxa bav û kalan e, serhildana  
 me kurdan e...  
 Erê ji bona Xwedê, ma bîra we nayê?  
 Çawa dewleta tirkan qelandin

Miletê me, li Geliyê Zilan e!..  
 Ji wê derê, berê xwe dane Diyarbekir  
 Jêkirin serê Şêx Seîd Efendî!  
 Mezinê me kurdan e...  
 Ji wê jî berê xwe dane Dêrsima  
 kurdan  
 Jin û zarokê Dêrsimê tamam xistine  
 xanî û şikeftan  
 Benzîn lê kirin, agirê sor bi ser de  
 berdane e!..  
 Wan kûçikên cendirma dest avêtin  
 keçikan  
 Serê wan jêkirin li ber dayika wana  
 Bi kêr û bi qaman e!..  
 Heta ku sax bim li darê dinyayê  
 Ji bîr nakim wan kul û êşê giran e!..  
 Êz bi xopana Sêrtê diketim, ciyê  
 îşkencê  
 Diyarbekira şewitî ciyê girtiyar e  
 Bi hezaran pêşmergê me kurda  
 Ji bo xatirê welatê me yê Kurdistanê  
 Can û bedenê xwe feda dane...  
 Erê bira dewran e, dewran e, bavo  
 dewran e...  
 Lolo bira dewran e  
 Bila xaliqê alemê vê sibekê  
 Kula xwe bêxe nav mala cumhurreis û  
 başbaqan e!  
 Çawa derdikevin televîzyonê  
 Ji me re dikin poropoxan e  
 Ew vê sibekê me ji hev re dikin neyar  
 û duşman e...  
 Bila xaliqê alemê pê bizane  
 Birayê piçûk pêşmergeyê li serê çiyar  
 e  
 Vê sibekê dawa wî, welatê wî yê  
 Kurdistan e.  
 Bila xaliqê alemê vê sibekê  
 Kula xwe bêxe nav mala cumhurreis û  
 başbaqan e  
 Çawa derdikevin televîzyonê  
 Ji me re dikine poropoxan e  
 Ew vê sibekê dawa wî, welatê wî  
 Kurdistan e  
 Birayê mezin hilaniyê bînamûso!  
 Tivînga tirkan e  
 Heta êvarê digere li pey rêça biran e  
 Ava bi navê Xwedê kim  
 Sona wê kuştin e gelî çahşikno!  
 Vê sibekê paşiya we poşman e.  
 Eva bi navê xwedê kim!  
 Herne ber serê asîmana  
 Winê werine kuştinê bi gulê  
 pêşmergan e!..  
 Jinê we wê herne mîran e  
 Zarok jî wê bikevin ber deriyar e..



Lawo winê vê sibekê  
 Tivînga dewleta tirkan teslîm bikin  
 Qismetê xwe bixwazin ji Xwedan e  
 Winê piştî xwe bidine çiyakî asê  
 Hêviya xwe bikin ji Apo, Evdila  
 Ocalan e.  
 Eman dewran e, dewran e, bavo  
 dewran e...  
 Wê de bavo bila Xaliqê alemê pê  
 bizane!  
 Piçê welatê tirkan tev davêjin okul û  
 mekteban e  
 Eman ji bona Xwedê û pexemberan!  
 Temam piçî tirkan û Cengîzcan e  
 Dixwînin mekteba, gava qezenc dikin  
 Wan dajon welatê me kurdan e...  
 Davêjin ser milê wan, terfî û rûtban e  
 Dişeyinin gundê me kurdan  
 Ji me re dikin amir û qomutan e  
 Eman ji bona xatirê Xwedê û  
 Pêxemberan!  
 Vê sibekê dest davêjin namûsa me  
 kurdan e  
 Li hafa me, ji wa dixin kiras û fistan  
 e!..  
 Ew însanê vê qebûl bike

Disa bêdîn e, bêîman e!  
 Birawo de bi hev re rabin  
 Vê sibekê dest bavêjin  
 Darê devreşa keleşkofan  
 Derkevin serê daxa û çiyar e  
 Winê herba xwe bikin!  
 Mîna egîd û qehreman e  
 Belkî Xwedê, emê welatê xwe kurdan  
 Xelas kin ji bin destan e..  
 Bêje ferman e, ferman e, ferman e..  
 Dayê ferman e!..  
 Bi Xwedê kim ferman, fermana serê  
 me kurdan e..  
 Kûpê me kurdan, qulbî li ba evdan e  
 Siûda me tune li ba rebê rehman e  
 Gaziye me naqedin li ba Xwedan e!..  
 Xwedanê milka ji xwe re ketine kêf û  
 seyran e  
 Em kurdên reben ji xwe re  
 Bûne êsirê wan gundan e...  
 Lo bira sibe ye, çaxê ray û seçiman e  
 Qeşmer lawê qeşmera!  
 Vê sibekê siwarin li texsiya û cîban e  
 Texsiyên xwe dixine rê û dirban e  
 Têne gundê kurdan e

Dibînin zarokên pênc salî  
Dibêjin merheba bavê min, tu çavan î?..

Ew kab û xar didine destê wan e  
Ji bo yê rayê dê û bavê wan e  
Nas nakin qubla misilman e  
Pêşî berê xwe didine mizgeftan e  
Berê xwe didine qubla filan e  
Hê dibînin mîhraba melan e..  
Bêdeng li wê dikin dû rekate deynê  
Xwedan e..

Dibêjin zarok a  
Dibêjin ka mele û axa û mixtarê  
gundê wê kîjan e?  
Zarok mixtar û mele û axalera didine  
nîşan wan e.  
Her axayekî pêncî hezarî  
Dixine bêrîk û cêbê wan e..

Axa destê xwe datîne ser singa xwe  
Wijdana xwe davêjê, dibê zilamekî tam e  
Melaîke misilman e!..  
Ji me re dibe başbaqan e..  
Ev kopekê axa, gava raya me ji me  
distînin  
Didine wan e..

Gava ew diçine Enqera şewitî  
Ez li qerewatê stûyê wan dinêrim  
Qerewatê dizan e  
Vê sibekê bûye toqê şeytan e  
Ketiyê stûyê wan e!..  
Porê serê wan, mîna keziyê jina ne  
Cenîkê wan, mîna dûvê sa ne  
Şûşa eraqê li ber wan e  
Temam bi hev re şuşê xwe hildidin  
Dibên "şerefe"  
Gelî bira, ewên ray dane me  
Gunehê me tamam di sukura wan e!

Gava tene raya  
Dibên emê ji we re çêkin rê û dirban  
Bînin cebran û çêkin kanî, mizgeft û  
mekteban e..  
Emê we tamam bêxin e îşan

**Bêje ferman e, ferman e,  
ferman e. Dayê ferman e!..**  
**Bi Xwedê kim ferman, fermana serê me kurdan e  
Kûpê me kurdan, qubî li ba evdan e  
Siûda me tune li ba Rebê Rehman e  
Gaziyê me naqedin li ba Xwedan e!..**  
**Xwedanê milka, ji xwe re ketine kêf û seyrane  
Em kurdên reben ji xwe re  
Bûne êsîrê wan gundan e...**

Emê bînin efûya mehkûmê serê çiyane  
Derê hepsê vekin li girtiyane e..

Ew bi vir û derewa rayê me, ji me  
distînin

Gava diçine Enqera şewitî  
Dibin baqan û başbaqan e  
Em êsîrê ewdal!  
Nakevine bira wan e..  
Ev zalimê lawê zaliman!  
Davêjin ji me re temelê hepsan e  
Ji me re dişeyinin kadroyê koruciyane  
e!  
Çawa bira ji bira re dikine neyar û  
duşman e!

Ji bona Xwedê û pexemberan!  
Ferman e, dîsa fermana serê me  
kurdan e!..

Lo bira ez bala xwe didimê  
Pêşiya êsîrê me kurda reviyane  
Çûne nav Alman e  
Îkîncî çûne Libyan e  
Uçuncî çûne Siûdê Erebiştan e  
Dordincî mane...  
Dev ji erd û eyal û namûsê xwe  
berdan e

(Di vir de yekê polîtîk li ser welat  
berdan û koçberiya kurdan diaxive,  
em vê axaftinê tevî nakin)

Dibe lo bira  
Ey bira ji bona Xwedê û  
Pêxemberan!!!

Vê sibekê tek û tûkê me kurdan mane  
Belê destê xwe avêtine yatax û yorgan e  
Berê xwe dane Enebolê  
Welatê tirkan e..

Siba disekinin li serê rê  
Sikak û qehwan e  
Çavê wan dimîne li çawîş û  
mitehîtan e

Heta kî nivro nakevine îşê giran e  
Ji nivro pê de diçine halê  
Ciyê sebzane  
Hildigirin barê giran e  
Piştî feqîra xera bûye ji kambaxê  
qasa û teblan e

Vê sibekê pênc rojan dixebitîn  
Rojekê dimînine "boş"  
Ew pênc roj jî heqê pariyek nan e..  
Berê xwe dide malê  
Bi dilekî kesiryê giran e..  
Zarok diçine pêşiyê  
Dibên bavê me ji me re aniyê  
pariyekî nan e..

Bavê wan digirî bi her du çavan e  
Dibê oxlim goştê laşê min heliya!  
Hestiyê min hev berdan e!  
Bi namûsa xwe kim!  
Di heyata xwe de, naçime welatê  
tirkan e!..

Hey ji bona Xwedê û Pêxemberan!  
Ez naçime welatê tirkan e..

Destê xwe davêjim darê devreşa  
Derdikevime serê daxa û çiyane e!

Lolo lo bavo gava bihar têtê,  
vê sibekê

Dîsa ev bênamûsê hanê  
Malxerabo dîsa poşman dibe!  
Damarê laşê wî dişuxilîn  
Dîsa berê xwe dide welatê tirkan e..

Çavê wa ji toza çimento, ji  
xubara kirêcê

Temam rijiyane, kor bûne  
Hafîz bûne, ketine ber camiyane e!  
Ev bêbavên tirkan di ber wan re  
diborin  
Serê qundera wan tûj e  
Li kêleka wan dixin  
Dibên kuro haydê lo kurdo!  
Dîsa "gût" wetan e!..

Lo lo bira...  
Winê bi ya min bikin  
Winê naçine welatê tirka  
Winê tamam vê sibekê  
Bibine pêşmerge  
Dîsa ji xwe re bikevine serê daxan û  
çiyane lo...

De lo bira!..  
Lo bira ez bala xwe didimê  
Dîsa bihara me hat  
Temamî êsîrê kurda  
Berê xwe didin şube û dairên wan e.  
Ji bona şeş meh muaqît  
Wan bêxine îşan e..

Gava diçine derê dairê wan e  
Li wan dikin dawa nivîs û dîploma ne  
Dibên "oxlim" te nexwendiyê, here  
Şeş mehên din dîsa îmtihan e..  
Ev feqîrê hanê piştî stûyê  
xwe dixwirîne

Li bertîla xwe dimîne poşman e!..  
Ez dêran im, dêran im! dêrana dîsa  
miletê me kurda me, dayê!..



CELALETTİN YÖYLER

Ji destpêka komartiya Komara Tirkiyeyê heyani vê dem û rojê, 72 sal dibore komarê her tim jiyana xwe ya rojane, bi talan û tajan û xwînrijandina kurdan domandiye. Di sala 1925'an de dest bi rijandina xwîna gelê kurd kiriye û ji hev nebiriye, hê jî dirijîne. Emê kîjanê bidine nîşan, kîjanê nedine nîşan, bi sedan mînakên hovîtiya wan hene.

Wekî niha qirkirina Zîlan û Dêrsim û Sason û Qoçgiriye, û hwd. Destê vê sazûmanê bi xwîn e. Ne îro bi tenê ku em dibêjin, leşkerên rejîmê serê gerîlayê kurd jêkiriye û lingê xwe daniye ser singê wî û wêneyên xwe kêşane, kirinên wiha li Zîlan, Dêrsim û Qoçgiriye jî pir hatine dîtin. Çawa ku sungûyên xwe li zikê pîrekên kurdan didan, zarok bi serê sungûyên xwe derdixistin. Ev hovîtî û tebatîya hanê ne îro ye ku tê kirinê, dîroka vê hovîtîyê pir kevin e. Di wan demên borîn de ji ber hinek sedeman ev hovîtî ji cîhanê re veşartî diman. Îro, çapemeniya kurd û ya

## Destê rejîmê bi xwîn e

cîhanê, derfîne holê, li ber çavên bi cîhanê dide radixîne.

Gelo çima ev gemariya han û tebatîya hanê ketiyê bingeha damezirandina vê komarê? Ji ber ku destgîrê komarê, di destê hinek despotên hemdemî û nijadperestan de ye. Lewma kar her-tim bi gemarî xwîn-xwarî tê meşandin.

Lê ewqas jî bêwîcdanî nabe, ma qey ew nizanin ku gelê kurd tu car koletî nepejirandiye. Despot jî baş dizanin çî dema ku gelek bi doza xwe ya serxwebûnê bawer be û wê nas bike, tu demê bi kuştinan naqede, nemaze gelekî ku ew 40 milyon be, jixwe qet bi kuştinan naqede, belkî ajero dide.

Ji ber van egeran, me hêvî heye ku ewên heyani niha hovîtî kirine û serê me jêkirine, hem jî em saxesax bi êgir şewitandine, hişê xwe bînine serê xwe û ji rewirî û hovîtîyê bizivirin.

Ev sazûmana vê komarê em pir xapandine. Carekê li Erzeromê, carekê li Sêwazê ê Çildêranê û Lozanê. Ji me re gotin: "Komar ya du gelan e:

gelê kurd û gelê tirk". Lê di pişt re dest bi xapandin û helandinan kirin û gotin: "Hûn ji tirkê çiyane in." Hem jî gotin: "Em yek gel in, ne du gel in, zimanê me tirkî ye, avîne bi zimanê kurdî qedexe ye." Lê vê rewşa xapandin û vehe-landinê jî tu pêşveçûnek ji rejîmê re neanî. Ji ber van sedeman xwîna her du gelan dane rijandinê, hem jî bi rijandineke bêfedî. Divê bê zanîn ku berpirsiyariya vê xwînê her bi tenê rejîma dagirkeran e. Pir pêwîst e ku êdî aşîxwazên her du gelan yên tirk û yên kurd, li hemberî vê rejîma faşîst a veşartî bi awayekî eşkere derkevin û jê re bibêjin: "Bes e, ev 70 sal e tu xwînê dirijîni û te tiştêk bi ser nexistî û di ser de tu rezilî bûyî, em gelê kurd û gelê tirk aşîtiyê dixwazin. Bes e hov-îtî, gel bi kuştinan nakevin û bi hêz dibin." Belê rast e, gelê kurd şer naxwaze, aşîtiyê dixwaze, lê bira xwîn-xwar baş bizanibin ku em bi mirinan naqelin û aj didin, em mirovên sedsala 20'an in, ne yê demên mêtîngerî, feodalî ne. Em êdî dost û dijminên xwe dinasin.

# Qurana bi kurdî û rojnameya Söze

**Mele Mihemed, mebesta xwe yê wergera Quranê dema tîne ziman, wiha dibêje: "Ji tirsan ez bi şev dixebitim. Ku ez bigirtima û darve bikirina, tenê ezê li ber nîvco mabûna berhema xwe biketama. Êdî berhemê tamam bûye, çi dikin, bila bikin!.." Lê rojnameya Söze ku Quranê belav dike nijadperestiya tirkên dike.**



**R**ojnameya herêmi ya bi navê "Söz" ê ku li Diyarbekirê çap dibe, da zanîn ku ewê di meha Remezanê de bi kuponan Qurana bi kurdî, xelat bidin xwendevanên xwe. Li ser vê daxuyaniyê tîraja rojnameya "Söz"ê pênc hezar zêde bû. Quran, ji aliyê meleyekî bi navê Mehemed Şêrin Keskin ve, bi tîpên (herf) erebî hatiye wergerandin.

Li ser vê agahiyê bi telefonê me xwe gihand rayedarên rojnameyê. Berpirsekî rojnameyê yê bi navê Metin Odabaşı derket telefonê, lê pirsên me bi piranî bêbersiv hiştin. Bi tenê got: "Me biryara belavkirina Qurana bi kurdî ji bo xizmeta gel stand. Ev biryar li ser daxwaza xwendevanên me ye. Hê ji vêga ve, tîraja me pênc hezar zêde bûye. Roj bi roj jî zêdetir dibe."

Mele Abdullah Varli, Quran bi tîpê latîni û erebî, wergerandiye zimanê kurdî. Dema me pirsra "Hûn ji bo çi wergera Abdullah Varli ku bi tîpê latîni û erebî ye belav nakin, lê Qurana bi tîpê erebî belav dikin?" li wan kir, bersiva wan balkêş bû:

"Qurana bi tîpê latîni jî hûn belav bikin!"

Ronameya "Söz"ê her wekî ku tê zanîn li dijî têkoşîna kurdan e. Têkiliyên xwediyê rojnameyê Akif Altındağ bi dewletê re û nemaze, bi Waliyê Rêvebiriya Awarte (OHAL) re xurt in. Bavê wî jî Mehmet Ali Altındağ jî, heta cuntaya 1980'an meleyekî berçavkîroşekî

ji rêzê bû. Lê piştî cuntayê, ku bi Kumananê Kolordûya 7'an Kemal Yamac re kirîvatî danî, bû dewlemendekî herfî mezin ji dewlemendên Tirkiyeyê. Rojnameyê wanê din ku nijadperestiya tirkên dike, li bajarê Stenbolê bi navê "Yeni Sayfa" tê wêşandin. Memed Ali Altındağ, olperestiya xwe bi nijadperestiya tirkên ve girê dave.

Ji aliyê din ve me xwest em bi Mele Mihemedê ku Quran wergerandiye zimanê kurdî re têkilî deynin, lê di gel hemû hewlan me ev yek pêk neanî.

Mele Mihemed, di 1992'an de, mebesta xwe ya wergerandina Quranê, di rojnama "Özgür Gündem"ê de wiha anîbû zimên: "Min xwest ku mîletê me, dîne xwe bi zimanê xwe hîn bibin. Pêxemberê me, di he-dîsekî xwe de gotiye 'Du lib du lib tîrî bixwin' Û du lib du libê bi kurdî gotiye. Dikarîbû bi erebî isteyn isteyn jî bigota..."

Dema min dest bi wergerê kir, min her tişt da ber çavên xwe.. Wê demê Kenan Evren dest danîbû ser hikûmetê. Ji tirsan ez bi şev dixebitim. Ku ez bigirtima û daleqandana, tenê ezê li ber nîvco mabûna berhema xwe biketama. Êdî berhemê tamam bûye, çi dikin, bila bikin!.." Û di wergera eslî de "Bismillahirrahmanirrahîm" jî, bi rengên kesk û sor û zer hatiye nivîsandin.

RAHMÎ BATUR

**NÇM**  
**cihekî din**  
**jî vedike**

**D**i 3'yê reşemiyê de Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) ji bo karibe berhemên xwe yên li ser çand, huner, folklorê kurdî û hwd. bi awayekî rehetir pêşkêşî gel bike, li cihekî din jî bi cih dibe. Ev yek wê bi şahiyekê pêk were. Cihê NÇM'ê yê nû li ser Cadeya İstiklalê ya Beyoğluya Stenbolê ye. Cihê ku li gorî berê gelekî fireh û mezin e, tê de kafeterya û saloneke konferansê ku kare 150'î kesî bigire, hene. Rayedarên NÇM'ê diyar dikin ku ewê li cihê xwe yê nû wekî akademyeke çand û hunera kurdî xebatê bikin û berhemên xwe pêşkêşî zêdetir însanî bikin. Wê di salona nû de xebatên wekî şano, folklor, muzîk û konser bi rehetî bînin dayîn. Tê gotin ku ew ne bi tenê ji bo çalakîyên xwe (NÇM)'ê bê bikaranîn, her wiha, wê deriyê wan rêxistinên demokratîk û derdorên



kurdan jî vekirî be, da ku konferans û konserên xwe pêşkêşî gel bikin. Odeyê jî bo xebata li ser perwerdehiya çekirina filman jî tê terxankirin.

Navenda Çanda Mezopotamyayê ev 5 sal in bi xebatên xwe yên li ser çand, huner, muzîk, folklorê kurdî nav daye, dewletê gelek dijwarî derxistine pêşberî çalakîyên NÇM'ê û şanoger, rêvebir û hunermendên ku di NÇM'ê de xebatê dikin hildane binçav, cezayên pereyan li wan hatiye birîn û ji bo girtina vê saziyê doz hatine vekirin. Ji hêla din ve di serî de şaxa İzmîr û

Amedê, hêzên dewletê avêtine ser şaxên NÇM'ê û gelek mêvan û xebatkarên wê girtine. Niha Seroka Giştî ya NÇM'ê tevî 6 hevalên xwe li Girtîgeha Amedê girtî ye.



● 8 reşemî 1925:

Sala 1922'yan li Ezeromê di bin serokatiya Mîralay Xalit Begê Cibrî de Civata Azadiya Kurdan ava bû. Kurd di bin sîwana vê de di demeke kurt de li Bîlîs, Mezra, Amed, Ruha, Sêrtê û li pir deverên Kurdistanê dest bi xebatên rizgariyê dikin. Şêx Seîd, Şêx Abdullah, Şêxê Paloyê Şêx Şerîf jî beşdarî vê xebatê dibin.

Şêx Seîd ji bo birêxistina gel, li Kurdistanê digere, di vê navberê de, der heqê Şêx Seîd û çend serokên kurdan de, ji aliyê mehkemeyê ve biryara tewqîtkirinê tê derxistin. Şêx Seîd bi mêvartî diçe Pîranê, mala birayê xwe Abdurahîm, mifrezeyek cenderme bi ser wan ve digirin, teslîmbûna Şêx Seîd û hevalên wî dixwazin.

Ew jî vê yekê qebûl nakin û di navbera wan de şer çêdibe. Ev şer dibe destpêka serhildanê.


● 9 reşemî 1988

Li Girtîgeha Amedê, ji bo rabûna îşkence û li hemberî qedexeya li ser mafan, tevî malbatên xwe ketin rîjîya birçûbûnê. Di roja 11'yê rojîyê de hêzên dewletê ji bo greva girtiyan tîk bibe, dest bi sargûnkirina dîlan kirin. Di pêvajoya vê sargûn û îşkenceyê de M.Emîn Yavuz li riya Girtîgeha Aydinê şehîd ket. Vê bûyerê li seranserê Tirkîye û Kurdistanê deng veda. Grewa bi serkeftina dîlan qediya.

AWIR

Salnameya bi kurdî

1996  
SALNAMEYA  
ROJ  
BI DEMJMÊR



Hicrî: 1416 Şaban 10 ● Roj: 1 Sermawez 55  
Romî: 1411 Berfanbar 19 ● Dirêjbûna Rojê: 00 D.

	AMED	STENBOL
Sibe	5.01	5.50
Tev	6.30	7.21
Nivro	11.26	12.14
Berêvar	13.53	14.32
Ûvar	16.13	16.52
Siv	17.37	18.19

1996  
Rêbendan  
1  
(Meha 1.31 roj)  
Duşem

Ji bo zarokên we nav  
Keç: Ajda  
Law: Elîşer

Sersala 1996  
Dagirkirina (Fetih) Mekke yê (630 Z.)  
Tal be jî rastiyê bibêjin.  
Hz. Muhammed

SALNAMEYA ROJ, BI DEMJMÊR

Berga salnameyê

Rûpela yekemîn a salnameyê

Sal li Stenbolê salnameyêke bi kurdî hate weşandin. Ew weşan bi destê Weşanxaneyê DOZ'ê hate kirin. Ev cara pêşîn e ku, li bakurê welêt kurd salnameyêke bi vî rengî amade kirine. Salname xwerû bi kurdî ye. hema bibêjin tevde bi kurdî ye û ji heftê rojek jî bi kurdî (zakî) ye. Bi tenê roja şemiyê cih dane kirdî.

Salên borî jî, bi kurdî salname derketibûn, lê belê ew salname bi sistemê klasîk hatibûn çêkirin. Di wan salnameyan de tenê navê rojan, navê mehan û hinek rojên taybet ji dîrokê, nemaze dîroka kurdî. Jixwe zêde agahî jî tê de tune bûn.

Taybetiya vê salnameya nû jî, cudatiya wê ya di vî warî de ye. Lewre ev salname bi agahiyên bingeîn tîrtîjî ye. Wekî ku mirov her roj rûpelekî pirtûkekê jê bike û bixwîne. Însan bi saya serê wê, bêyî ku xwe biwestînin ji gelek tiştan agahdar dibin. Di nava rûpelên salnameyê de gelek tiştên girîng tên dîtin. Ew agahî di jîyana rojane de gelek feydeyê digihînin însanan.

Li ser salnameyê, me bi Xwediye Wêşanxaneyê Dozê Ahmet Zeki Okçuoğlu xeber da. Ahmet Okçuoğlu agahî dan me ku ji berê de ramaneke wî ya ji bo vê yekê hebûye, lê îsal karibûye ku

wê derbasî pratîkê bike. Okçuoğlu derbarê salnameyê de wiha ji me re peyivî: "Dema ez hîn di girtîgehê de bûm, fikra amadekirina berhemeke wisa bi min re çêbû. Piştî ku ez derketim, min dest bi vê projeyê kir. Armanca me ew e ku em ji gelê xwe re berhemeke wisa hêsan amade bikin ku ew, jê istifade bikin. Ji ber ku nivîsên giran bala gel zêde nakîşînin. Ji ber van sebebên salnameyêke agahdar ji bo dagirtina vê valahiyê cihêkî girîng distîne. Baweriya me ew e ku, me di wî warî de peywira xwe aniyê cih."

Gotina dawî li ser mijarên ku di salnameyê de cih digirin wihane:

"Sal, meh û roj; navên zarokên kurd; li gorî hesabên romî û hicrî yên salan; ferqa demjmarên Stenbol û Amedê; grafîka demjmarê; wêcizeyek an ji gotinê pêşyan; qismên balkêş ên destanên ku li ser evîn û li ser qehramaniyê hatine çêkirin; ji şairên kurd û yên gerdûnî helbestên cihêreng; pêkenok, fêl û nivîsên edebî yên xurt; çêkirina xwarinan; agahiya ol û erf-adetên kurdan di nava vê salnameya rojê ya bi demjimêr de cih digire"

DÜZGÜN DENİZ



ALTAN TAN

ÇAVDÊRÎ

Dergûşa olan  
Mezopotamya

Tîştêkî xerîb e ku jêderka hemû olên semawî Mezopotamya ye. Temamî dîroknasan bi baweriyêke hevpar Mezopotamya wekî devera zayîna şaristaniyê qebûl dikin. Di Qurana Kerîm de jî, di Tewratê de jî tê gotin ku piştî tofanê keştiya Hz. Nûh li Çiyayê Cûdî daniye.

Li gorî baweriya muşterek ji bo beşer, piştî Hz. Adem Cûdî bûye cihê zayînê ya duyemîn. Hz. Brahmî li Ruhayê û pismamê wî Hz. Lût jî, dîsa li eynî herêmê jiyaye. Cedê Benîsraîlan Hz. Yaqûb kurê Hz. Îshaq e; her wiha neviyê Hz. Brahmî e jî. Benîsraîl jî Mezopotamya Jorîn hatine Filistinê.

Her wekî din, cedê mezin yê Qebîla Qureyşyan û Hz. Mihemed (A.S), Hz. Smaîl jî kurê Hz. Brahmî e.

Hz. Zulkufî li Erxena Diyarbekirê, Hz. Yûnûs li Mûsilê û Hz. Eyûb li Ruhayê jiyane. Ev hemû xelekên eynî ristî ne. Hikmet û zanyarî di dema sumer, akad, babîl, elam, asûr, med, pers, ûrartû, mîtanî, hurrî, kasît û aromiyan (suryanî) de hêşîn bû û berhem da. Dîsa di wê demê de pêxemberan li dijî zalimên wekî Nemrûd tîkoşîn dane. Piştî Hz. Muhemed Nûra Tewhîdê ji Kafkasan heta bi nivê Ewrûpayê, ji Asya Navîn heta bi Rojhilata Dûr (Çîn, Malezya, Filîpîn, Endonezya) û li Afrîkayê belav bûye. Dema ku medeniyeta îslamî şewq dida, ji Endîlusê heta Îndonezyayê dînya dewra xwe ya herî bi ihtîşam dijiya. Ewrûpayî, rewşa xwe ya îro deyndarê mîrata zanyariya misilmanan e.

Kes nikare Nûra Tewhîda ku ji dema destpêka mirovatiyê de li Mezopotamya çirisiye, vemirîne. Tu fikra ku dijminatîya hikmet, zanyarî û îslamiyê bike nikare li Mezopotamya xwe bigire û bijî.

Îro barê me zarokên Mezopotamya yê çîlekêş dîsa giran e. Karê ku divê bi me bînin kirin, gelek in.

Heta em Nemrûdên hemdem ên ku Mezopotamya kirin xerabe ji nav xwe ranekin, tu hizûr û rehetiya me çênabe. Divê bi mitbexa herî dewlemed a dinyayê, bi edebiyat, muzîk û folklorê xwe, bi ilm û zanîna xwe ji nû ve vejînin û em ronîya şaristaniya xwe li hemû deverên dinyayê bireşînin. Divê evînen Melayê Cizîrî û Mem û Zînê ji nû ve bînin jiyîn û li keviya Ferad û Dîjle "Li Çayê Çira" bê listin. Divê dengbêjên me kilamên xwe yê herî xweş ji bo pêşerojê bibêjin.

Li hemberî Nemrûdên hemdem destên xwe bidine destê hev: Serhildan Jiyan e.

# Mirin jiyaneke

**Behzad Gedro, hunermendê teşkîlî, ji kurdên Başûra Biçûk û her wiha lawê bavekî hunermend e. Bi bûneya (munasebeta) Sala Ehmedê Xanî û 300 saliya destana Mem û Zînê,**

Hoşeng Kurdaxî **bi zimanê erebî hevpeyvînek pê re çêkir.**

Dr. Şêrko Bedirxan **jî ew wergerande kurmancî.**

## Behzat Gedro

### Hunermend

**Behzad Gedro, kurê hunermend Ezîz Gedro ye û di sala 1965'an de li gundê Bêne (Efrîn) ji dayika xwe bûye.**

### Wî zanîgeh

**di warê kîmyaya pratîkî de kuta kiriye û di dema xwendina xwe de li gel hevalên xwe yê hunermend pir pêşangehên hunerî çêkirin. Piştî kutabûna zanîgehê jî wî heta niha bi bûneya (munasebeta) kurdayetiyê gelek pêşangeh pêşkêş kirine, wekî: Roja Helebçeyê, Roja rojnamegeriya kurdî, Cejna Newrozê û hwd. Tabloyên wî sînore welatê me derbas kirine, ew li van welatan jî belav bûne: Misir, Urdin, Iraq, Almanya, Fransa, Swîsre.**

**M**amoste Behzad hûn çî dikarin li ser xwe ji me re bibêjin û kengê we dest bi hunermendiyê kiriye?

—Bi bîra min tê, ku yekem car min parçek caw û qutiyên avrengîn, karton û xameya wênêkêşiyê li hawrîdora xwe dîtîn, birayên min û bavê min ew danîbûn. Bi vî awayî min dest pê kir. Gava bavê min, ew wêne dît û ji ber ku ew bi xwe jî hunermend bû bi ser de jî mamosteyê hunerê bû, bala xwe baş da rêzikên rengên min, yê ku min tê de xweser, hesasiyefî û nîşanên hunerî dabû xuyakirin. Lewre bavê min, girîngî da min û herdem têbîniyên xwe yê akademyê ji min re digotin.

Pişt re min pirtir wêne nîgar kirin, min di dibistana seretayî de, tabloyên hunermendên hevdema surîştê bêdeng û nîgar-kirina tabanan teqlîd dikirin.

Gava ez di xwendegaha navîn de bûm, min di bin akama bavê xwe yê hunermend de, dest bi wênêkêşiya rengên zêfî kir. Min di hundirê xwe de û ji cem xwe pir tabloyên kevin, surîşt, jin, mirovên tazî (moda tazî) û her wiha, min pir tablo ji tabloyên cihanê, Sêzan, Rênwar, Monê wergirtin.

Ez di pêşangehên hunerî û dibistanê de, bêpar bûm. Bi rastî jî, xweserî û hesta germ di tabloyên min de riwestên seretayî bûn û piştî ku min li hunera zarokî temaşe kir, ez tê gihîştim ku di hunera zarokî de hesasiyefiya xweser pir diyar dibê û ew dûrî dibistanên hunerî ne.

*Huner bi xwe alavek e. Bi wê, hunermend hundirê xwe, zanîna xwe, ramanên xwe, hezkirina xwe û pir pirsgirêkên rojane tê de nîgar dîke. Hûn çî di vî warî de dibêjin?*

—Hemû diyarde û nîrxên efkî (ehlaqî), bi hîs û bi pir bûneyên xwe ve, di hestên hunermend de têkilayî dikin û li nik wî rewşek xweserî û taybetî ava dîke. Ew bi vî rewşa hanê, di civaka mirovatî de dikeve pileyê bilind, ji ber ku ew hunermend bi riya berhemên hunerî, rastiyên veşartî, peçinî û yê rastîn, ji civakê re eşkere dîke.

Bi bawerîya min, karê hunerî, encama şoreşan, di hundirê mirov de ye.

*Hûn ji navçeya Efrînê ne, lê bi xwe*

*hûn li Helebê mezin bûne û ta niha jî lê dijîn. We çawa wijdan û giyana xwe ya netewehezî bi jiyana Helebê ve girê daye?*

—Heleb bajarekî qeşeng e, bandora xwe ya hunerî li min kiriye. Tax û kolanên Helebê ristwerî ye, xweşikbûnên wê yê nemaze hene. Ew bi kelepor û pêwendiyên xwe yê dîrokî, ji pir hunermendên herêmî û cihanî re bûbû çavkaniyêke hunerî.

Hîn di hijdeh saliya xwe de, min pir seyrangeh, carinan bi tenê û carinan jî tevî komên hevalan, li navçeyên Efrînê û Cizîrê kirine. Mebesta min ew bû ku ez neteweyetîya xwe ya rastîn nas bikim.

Rast e, ez li Helebê mezin bûm û bi şahî û tengezarên wê jiyam, lê ez bi biyanîstaniyê û bêzariyê hest dibûm, lewre ez li pir gundên me geriyam û bi şadbûnên wan şad bûm û bi şînen wan bêzar bûm. Min bi kalan û zarokan re têkilî danî, dan û standin bi jinan re kir. Sê-çar salan ez di vî heyamê de dijiyam, tevî vî yekê

min Heleb berneda.

*Min pir tabloyên we dîtine û ya he girîng bi ya min ew postera Helebçeyê, bi navê "Mirin jiyaneke nû ye." Li gumana min de wê nasdariyêke mezin Kurdistanê û li cihanê stand. Hûn çî ser vî tabloya nasdar dibêjin û çima gelê kurd ji wê hez dîke?*

—Huner bi xwe, berî her tiştî banga hunermend e, li pêş xwe û li pêş jîne ye. E banga bêdeng, elementên wê, reng, xêz, teşkîlî û gava helwestek bandora xwe pîkûr li psikolojiya hunermend dîke, li nîwî û di hundirê wî de, heyameke hîstîrî-hunerî peyda dibê.

Jenosîda Helebçeyê, di rojên 16-17' adara sala 1988'an de, tesîra xwe li he kurdekî kir, heta kir ku ew bi zimên, bixwînê, bi dîrokê û bi têkoşînê, bi kurdên Kurdistanê Iraqê ve girêdayî bimîne.

Ez bi tijî hestên xwe, bi vî bûyera tengezar re jiyam, min xwe yek ji wan kesên didît. Min çend tablo di vî rewşa xwe yê psikolojîk de nîgar kirin, lê ez ji wan tab



Behzat Gedro (Li milê çepê) û Hoşeng Kurdaxî

**Kî ye?**





Tabloyeke humermend Behzat Gedro

loyan ne razî bûm. Kêmanî tê de hebûn, lewre wan daxwazên min ên psîkolojîk û hunerî têr nekirin, du sal tê per bûn (derbas bûn), pir guftûgo li ser Helebçe û sedemên wê, planên dijminan, dek û dolabên Sovyetê û hwd. çêbûn. Ez bi pir rewşênbîr, rêzan û kesên ji rêzê re rûniştim. Min hest dikir ku ew roj bi roj, ji wateya rastîn bi dûr dikevin. Helebçe di nav ken û şevbuhêrkên demderbaskirî û kêfê de bi bîr dihat. Te digot qey ew dixwazin bi Helebçeyê denkirinên xwe dewlemend bikin. Vê rewşê, ez hîn pirtir germ kirim û li dawî ez bi rewşa xwe ya psîkolojîk û hesasiyeta giham pileyek zor bilind û berhema min (postera Helebçe), encama vê kelê min bû.

*Çi rola jinan û bi taybetî rola jina kurd di jiyana we ya hunerî û civakî de heye?*

—Bi navnîşaneke biçûk, jin wateyeke ji wateyên jiyana zindî ye, jin ji mêran re wijdana jiyane ye. Pêwîst e mirov têkeve kûraniya derûnî ya jinan, yanî jiyana wan. Çimkî, eger kesek jiyana jinan tê bigihe, ew wateyeke nixbuha, ji wateyên jina têdigihe.

Pêdariyên jinan di vê cihanê de ji pêdariyên mêran mezintir û diwartir in, lê nemaze barê jina kurd ji barê mîrê kurd girantir e. Ew li ber xwe dide ku, mîr û zarokên xwe ji xwe razî bike; ew li ber xwe dide ku, serbestiya xwe bistîne û wekheviya kar dixwaze. Ew li ber xwe

dide ku sebra xwe li pêş cihanê mîlag bike.

Di tabloya buhara asê de, ya ku min di sala 1990'an de nîgar kiriye, jin tê de xwe-diya rola bingehîn bû. Jin, tê de berî her tişti ji xwe asê bûbû, paşê ji civaka şûnketî asê bûbû û pişt re ew ji zordestiyê asê bûbû. Ev asêbûn, li ser bingehên neteweyî, şaristanî, hemdemî pêk hatibûn. Her wiha di tabloyê de, nêrîneke netewehezî ya nûjen hebû.

Rola jinan, di jiyana min a hunerî û komeleyetî de hişk bû, jin bi rewîştî xwe ya xweşgermî, çareyên navîn nizane, ew pir hez dike an jî ew pir bi kîn dibe.

*Li ser ramanên "divê huner ji cema- wer re be" û "divê huner ji hunerê re be", hûn çî dibêjin?*

—Di bawerîya min de, rexnevanan ev mesele afirandine. Huner ji bo hunerê an huner ji bo civakê û hwd. Rexnevanan dixwestin bi van pênavkirinan, navero- kên berhemên hunerî û wêjeyî bidin ronî- kirin. Nîmûne, wênexandina mijareke ciwan û apstraktî, rexnevan jê re dibêjin ev hunera ji bo hunerê ye. Wêne li ser ka- rekî rojane û li ser pirsên cemawerê be, jê re dibêjin hunera konkret (multezên). Tabloya hunerî berhema hunermend e, tê de nêrîn û akamên li wî bûne, hene. Hunermend ramanên xwe, romansiyên xwe û helwestên xwe ji jînê, tê de dide diyar- kirin. Belkî hunermendên îro, karkerekî nîgar bike û sureta jineke tazî wêne bike, emdî karin bibêjin huner wê ji hesta hunermend derkeve.

Eger em hunerê bi rêbazeke ramani serbixwe ve girê bidin, yanê em faktora xweserî û hundirî li nik hunermend diku- jin. Çimkî ew faktora xweserî û hundirî, dibe sedema her karê ciwan û nû. Rêba- zên çanda biyanî, diherin û tên. Ronakbi- rê kurd bi ramanên xwe ne serbixwe ye û pêwîst e çand û ramanên xwe, bi çand û ramanên biyaniyan ve girê de. Pêwîst e nêrînen wî pirtir gelemper û realist bin, pêwîst e armanca çanda kurdî, pêkanîna îdolojîyê kurdî, serbixwe be û bila ew nekeve xizmeta berjewendiyên rêxistin û partiyên.

*Hûn çawa tengêha hişê mirovê kurd, di warê hunerê de dibînin? Ew ta kîjan radeyê, kare bi berhemên hunerî re têki- liyê deyne û rastiyên psîkolojîyên huner- mend têbigihe?*

—Astenga herî bingehîn a ku li pêş

kurdan wekî diwaran radiweste, tengêha hişê mirovê kurd e. Min ji nêzik ve dirok, bermayên hunerî û berhemên şaristanî yên gelê kurd, xwendin. Ez giham baweriyekê, ku sedema nizmbûna hişê mirovê kurd bermaya hişê kurd e. Di diroka kur- dî ya kevn de, ga pîroz e, ga xurt e, ser- hişk e, sergerm e û bêhn qalind e; erê ev berhevdana min hişk e, lê me ev yek diti- ye.

Ev hişê şûnketî, hişê mirovê kurd li- wan kiriye û nehiştiye ku ew bi ramanên hevdemê re û bi hunerê re bimeşe. Kurd ji hunerê û bi taybetî ji stran û semayê hez dikin. Ew ji hunera teşkilî hez dikin, lê ew pê xweş nabin. Yanê, jê zewqê nas- tînin, çimkî çandê bilind pêwîst e ta ku mirov karibe tîkiliyê baş bi hunerê re deyne. Lewre ez cudabûneke fireh di navbera hişê kurd û hunera teşkilî de di- bînim. Mirovê kurd, hunera teşkilî tê ne- gihîştiye. Lewre, ew nikare hunermend û psîkolojîya wî jî tê bigihîje.

*Huner ji nixbuhatirîn berhemên civa- kê ye û ev berhem her dem li xwe dide ku ew bibe berhemeke cihanî û sînora nete- weyî derbas bike. Bi ya we, berxwedane- ke çawa pêwîst e ku hunera kurdî karibe bibe hunereke cihanî?*

—Rola hawirdorê di amadekirin û ava- hiya nixbuhayên hunerî û qeşengî de, di her civakê de heye. Gelê kurd, ji demên kevn ve di hembêza surîştî bedew de di- jî. Surîştî kurdî, tîkel û dijberî ye. Tay- betiyên kelepor û folklorî me hene. Ha- wîrdora kurd, pir caran bûye warên gelek hunermendên kurdan û kesên din. Mejiyê hunera teşkilî ya gelê kurd, pir dûr nare, tevî wê, hunermendê kurd karîna xwe di pêkanîna reng, xêzik û teşkilî de mîlg ki- riye. Têvî vê jî, hunera kurdî di çarçove- ya netewetiyê de maye. Lê ev jî, ji enca- ma du sedeman pêk hatiye.

Dûmahîk: Rûpel 15

● Hunera kurdî di çarçoveya netewetiyê de maye. Lê ev jî, ji encama du sedeman pêk hatiye. Yekemîn: Rewşa rêzanî ya ku gelê kurd tê de dijî. Duyemîn: Negatîviya pêwendiyên gelê kurd û tevgera ramyarî yên bi hunerê re

● Îsal bi bûneya 300 saliya destana "Mem û Zînê" min portreya Ehmedê Xanî bi rengên kurdî, resenî, wêne kiriye. Di tabloyê de, xemilandina kurdî diyar e û min ber reşbûnek li pêş portreyê jî eşkere kiriye. Ew jî nîşana bêzariya keça kurd e, yanê bêzariya Zînê ye. Min di tabloyê de li ber xwe daye ku ez êşa naveroka destanê bidime nasîn.



Bavê Orhan Kemal, A. Kadir Kemalî berê Serekê Mehkemeya Îstiklalê bû pişt re bû bersûcê wê

# Ew muhalîtê Şef bû û wisa jî çû gorê

**H**üseyin Avni, Alî Şükrü û Abdülkadir Kemali, sê kesên navdar ên Meclîsa Yekmîn in. Axaftina roja 24'ê rezbera 1921'ê pir manîdar e.

"Gel hemû serweta xwe, heta derpiyên xwe jî daye hikûmetê, lê di gel vê hikûmet dixwaze mecbûriyeta xebata b bedenî jî li ser piştê gel ferz bike.

Ev tê vê wateyê ku, hûnê beta bibehcecin jî bi bedena xwe bixebitin. Dîjbertiya wî ya rojnamevanîtiyê, li ser ku careke din ji bo Meclîsa II. nehate "ta-yînkirin" hin bêhtir tûj û tûnd bû.

Ev rewş jî bû sedem ku wî bişînin dadgeha rizgariyê. Îktidara wê demê, vê carê Kuva-yî Milliyyeyî yê berê, Serokê Heyeta Dadgeha Rizgariyê ya Pozantiyê, wekî bersûc şande dadgeha rizgariyê. Qanûnê "Tahrîr-î Sukun" li meclîsê dihate nîqaşkirin. Recep Bey (Peker), ku yek ji serkêşên Cumhurriyet Halk Fırkası bû, li ser kursiyê ev gotin digotin: "Berpîrsên Serhildana Rojhilat ên herî li pêş ev in. Di serî de meclîsa millet, wan êrişî hemû saziyan kirine. (...) Ji lew re bi weşan û telkînen xwe, bûne sedem ku serhildan derkeve. Mebesta me ew e ku em, hêlîna van maran birûxin û wan bêdeng bikin. Heta ku em van nepelçiqînin, welat rihet nabe. Qanûnê di destê me de, wê li van weşîyên tehrîbkar bigere, bibîne û dengê wan wê bifetisîne. Heke ev mar, ev hêlînen jîdar bi hêza qanûnan neyêne pakîjîkirin, ne mumkun e ku welat xweşiyê bibîne."

## Kemalî tevî rojnameya xwe wekî "hêlîna maran" têdîtin

Li ser van gotinan, rojnamevan di 1925'an de hatin şandin da ku li Dadgeha Rizgariyê ya Mezrayê bêne darizandin. Abdülkadir Kemali û rojnameya ku bi navê "Toksöz" derdixist, mîna hêlîna mar dihatin dîtin. Hikûmeta kemalîstan a wê demê, ji bo "xweşiya welêt" biryara girtina rojnameyên ku di warê çapemeniyê de mîna "hêlîna maran" dîtîbû, dabû girtin. Kuvay-î Milliyyeyî demekê, di salên 19-25'an de wekî "dijberê ku divê ji holê bê rakirin" dihate dîtin.

Di şeş adarê de, Heyeta Wezîran biryara girtina rojnameya "Toksöz"ê dabûn, ku A.Kadir Kemalî ew di 1923'yan de li Edeneyê derxistibû.

Wan "Toksöz", bi hinceta ku "ahalî tahrîkî îsyane" kiriye, girt. Di 7'ê pûşpera 1925'an de biryara girtina wî dan. Di 21'ê pûşperê de ew gritin û şandin Amedê. Mebûsê Kastamonuyê A. Kadir Kemalî bi behaneyê ku bûye pêkerê (faktoreki) Serhildana 1925'an hate cezakirin. Serokê Dadgeha Rizgariyê bû bersûcê wê. Rejîmê, xwestibû dengê dijber bifetisîne.

## Dijberê wêrek

Di salên 1924'an de, wî li Edeneyê di rojnameya xwe de, îktidara dema xwe bi awayekî tûnd rexne dikir. Di 15'ê sermawezê de, di "Toksöz"ê de wiha dinivîsand: "Teşkilata îro, ne teşkilata gelêrî û gel e, teşkilata zûmreyekeserdest e."

Di 16'ê berfanbarê de jî sazûmana "şefîtiyê" rexne dikir. Rexneyên wî şef nêrehet kirin. "Toksöz" bi hinceta ku "ewletiya neteweyî xera dike" hate girtin. Di 12'yê rêbendana 1925'an de, bi sebebê ku "raya giştî tevlihev kiriye" hate cezakirin. Îradeya şef musamaha û azadî nîşanî ramana dijber neda. Lê, heke ji "şef" efû bixwesta dikarîbû mafê jîne bi dest bixista.

Di nivîsara (metna) efûya ku wê ji şef bihata xwestin de, van gotinan cih digirtin: "... Em tu car ne li hemberî nûti û esasên înkilaban in. Em zehf xemgîn in ku der barê me de hin nêrinên din hene, wê efûya we di jiyana me ya rojên li pêş de, bibe sedem ku em di rîya rast de bimeşin. Em hêvîdar in ku hûnê vê yekê ji me teksîr nekin."

A. Kadir Kemalî ev nivîsara ji bo efûyê, nepejirand. Bi hinceta ku pêwîst e azadiya pênusê hebe, di nivîsên wî de hêmanên (unsûrên) sûc nebûne, û imzekirina telgrafeke wiha ku wê were maneya qebûlkirina sûc, îmze neavête binê nivîsarê.

Li ser vê rewşê wê bersiveke wiha bidaya daxwazên hevalên xwe: "Em bi awayekî efû dixwazin. Lê di weşanên me de hêmana tawan (sûc) nîn e. Ez îmze nakim. Ez tercîha xwe dikim ku ez bêsûc razem, lê wê telgrafa tawan bi me dide pejirandin, îmze nakim."

## Siyaset û rojnamevanî lê hate qedexekirin

Telgraf bêyî ku îmzeya wî hebe ji Enqereyê re hate şandin. Dotira rojê

dadgeha rizgariyê hemû rojnamevanan serbest berdan. Lê der barê wî de, biryara şandina Dadgeha Rizgariyê ya Enqereyê hate dayîn. Wê li wir bihata darizandin. Çar meh û nîv li Enqereyê re girtî ma. Bi şert û mercê ku wê bi rojnamevanî û siyasetê re mijûl nebe, hate berdan.

Heta sala 1930'yan ji rojnamevanî û siyasetê dûr ma. Li Ceyhanê bi cotariyê û li Edeneyê jî bi parêzeriyê (ebûqatiyê) mijûl bû. Di sala 1930'yan de Ahalî Cumhuriyet Fırkası (Partiya Ahali ya Cumhuriyetê) demazirand û li polîkîkayê zivirî.

Bi avakirina Serbest Cumhuriyet Fırkası (Partiya Serbest a Cumhuriyetê) ku Mustafa Kemal dabû damezirandin, zen kir ku wê rêjîm derbasî demokrasîyê bibe. Di vê navê de rojnameyek bi navê Ahalî derxist. Waliyê demê, îradeya "şef" dizanibû; diyar bû ku wê hem destûr ji bo partiyê û hem jî, ji bo rojnameyê neyê dayîn.

A. Kadir Kemalî yê dijberê salên 1923'yan, dest bi nivîsên xwe yên ku tê de rexne li hikûmet û serok-komariyê hebûn, dikir. Bêyî ku dereng bimîne, Enqereyê fermana ku girtina partî û rojnameyê dihate xwestin, şande walîtiya Edeneyê. A. Kadir Kemalî, dizanibû ku wê bê "cezakirin." Rojnamevanê ku ji M. Kemal efû nexwestibû, bi dizîka derbasî Sûriyeyê bû. 8 sal li Heleb, Şam, Qudûs, û Antakyayê jîna surgûniyê borand. Malbata wî ya bi pênc zarok di tengiyan de bû. Dema ku li Lubnanê bû, bi firotina bazinên pîreka xwe debara xwe dikir. Orhan Kemal di van salan de ji bo ku ji aboriya mala xwe re bibe alîkar, dest bi xebatê dike. Di sala 1935'an de diçine Qudûsê. Di 1939'an de li ser mirina "şef" biryara vegeza li Tirkîyeyê distînin, li Edeneyê bi cih dibê. Di van navan de kurê wî Orhan Kemal, qedera xwe dijî; di Girtîgeha Qeyseriyê de hepsî ye.

A. Kadir Kemalî, di pey mirina Atatürk de tayîni Serokatiya Cezayê Giran a Bergameyê dibe. Orhan Kemal li Girtîgeha Bursayê ye. Îcar jî çilekêşiya Orhan Kemal, çîroknivîsê navdar dest pê kiriye.

Abdülkadir Kemalî, bi nasnameya xwe ya dijber, di 1949'an de li Enqereyê çavên xwe ji dinyaya gewrik re digire û diçe ser dilovaniya xwe.

WERGERA JI TIRKÎ:  
ZANA FARQÎNÎ

**Telgraf bêyî ku îmzeya wî hebe ji Enqereyê re hate şandin. Dotira rojê dadgeha rizgariyê hemû rojnamevanan serbest berdan. Lê ji bo darizandinê ew şandin Dadgeha Rizgariyê ya Enqereyê. Çar meh û nîv li wir re girtî ma. Bimerce ku wê bi rojnamevanî û siyasetê re mijûl nebe, hate berdan. Bi avakirina Serbest Cumhuriyet Fırkası (Partiya Serbest a Cumhuriyetê) ku Mustafa Kemal dabû damezirandin, zen kir ku wê rêjîm derbasî demokrasîyê bibe. Di vê navê de rojnameyek bi navê Ahalî derxist. Waliyê demê, îradeya "şef" dizanibû; diyar bû ku wê hem destûr ji bo partiyê û hem jî, ji bo rojnameyê neyê dayîn.**



**KOMA GULÊN MEZRABOTAN** kaseta xwe ya duyemîn bi navê "Ji dinê re aştî" derxist. Ev kom ji zarokên 4 salî heta 14 salî pêk hatiye û çalakiyên xwe di nava Navenda Çanda Mezopotamyayê de dimeşîne.

Gulên Mezrabotan bi vê mesajê ya ku li ser bergê (kapak) ye, deng li gelên dinyayê dikin: "Zarok kulîlk in û bi xweşîkbûna xwe, dinê xweş û geş dikin. Em dixwazin ku kulîlkên Kurdistanê jî di nava van kulîlkên reng bi reng de cih bigirin. Mirovên dijminê mirovahiyê îro dixwazin ku kulîlkên

Kurdistanê jî kokê de biçinin û ji holê rakin. Lê, şerê ku xelasiya hemû gelên Rojhilata Navîn e, kulîlkên Kurdistanê jî diparêze û Gulên Mezrabotan jî, bi serfirazî wekî hemû zarokên dinê, bi rengên kesk û sor û zer, li ser axa dinê cih digirin."

Gulên Mezrabotan di vê kasetê de 12 stranên bi 7 zimanî distrin (kurdî, erebî, tirkî, îngilîzî, fransîzî, almanî û yewnanî). Ji xeynî 2 parçeyan, gotin û muzîkên 10 stranên yê Rotûnda Yetkîner in.

Ev stran di kasetê de hene:

- Beşa A.** 1. 'ên-ku-1993 (kurdî)  
2. El Selam Lilaleem-1987 (erebî)  
3. Wek dîlan-1986 (kurdî)  
4. Anrufen-1992 (almanî)  
5. Newroz-1993 (kurdî)

- Beşa B.** 1. Çerçiyô (kurdî)  
2. Ne güzel kardeş olmak-1994 (tirkî)  
3. Fin a la cuerre-1993 (fransîzî)  
4. Welatê Me-1987 (kurdî)  
5. We are brothers-1993 (îngilîzî)  
6. .... -1976 (yewnanî)  
7. Awazên ji herêma Qocgiri

## RÛDAN

# Dilê Wêrek

Serê çend mehan e ku li Tirkîyeyê filmek tê nîşandan. Naveroka wê li ser mijareke dîrokî ye. Li ser şerên navbera Îskoç û Qralîtiya Îngilîz. Ji liyê teknîkê ve, ji aliyê muzîk û dîmenan ve, ji hêla sehneyên şer ve, ji aliyê kostûman ve, tam hewayê wê demê dide temaşevanan. Naveroka film wisa balkêş e ku, kesên li derê nivîsîne, xwe ranegirtine, gazî Nusret Demiral (Serdozgerê DGM'ê yê berê) kirine; ji awayekî henekî be jî. Ji ber ku film pêjn û îsîyatîyan hişyar dike, nazê wê kurdan.

### NASNAMEYA FÎLM

Nav: Dilê wêrek (Brave Heart)

Serlistikvan: Mell Gibson, Sopiha Marceau

Derhêner: Mell Gibson

Fîlm li ser bûyerên salên 1280-1314'an e, ku Qralîtiya Îngilîz dagirkeriya xwe bi awayekî hovane li ser gelên Îskoçî pêk aniye. Dema yek bizewiciya şeva pêşîn ji temsîlanê qral re bû. Ji vê yekê re "mafê şeva pêşîn" tê gotin. Her tişt û her kes malên qral in. Mirov bi gotineke qral dihatin kuştin, dihatin darizandin; bi destê qral efû dibûn. Bi kurtasî her tişt yê wî bûn û wî çî bixwes- ew dibû. Gotinên wî qanûn bûn.

Salên 1200'an, ku di dîrokê de tê gotin, dema Navîn, serdema feodalîteyê ye. Qralîtiya Îngilîz, bi darê zorê Qralîtiya Îskoçyayê vedigire (işxal dike) û li hemberî el dest bi zilmê dike. Gel ji van pir nerihet bibe, Lê pêşawayek, serokek nîn e ku bide pêşiya wan da ku tîbikoşin.

Xortekî gundî (Wallace) ku dilketiya wî ji dîla leşkerên qral ve tê kuştin, ji wan re serokatîyê dike û di demeke kurt de tevî gelê Îskoçî komî dora xwe dike û li hemberî qralîtiyê dest bi şerê azadiyê dike. Bi zêzenkirina çend şerên dijwar bi şûn ve, qralê Îskoç gazî wî dike û Xelata fêdîtiyê didê û jê re dibêje ku ji niha pê de wê bi hev re şerê azadiyê bidomînin.

Amadekirina şerekî pir mezin dikin ku qralê Îngilîstanê tîk bibin, lê qiralê Îskoç li ser şîretên bavê xwe di vî şerî de alîkariya Wallace nake, û Wallace tîk diçe. Careke din zêzen xwe komî ser hev dike. Kurê qralê Îskoç car din banî wî dike û dixina kêrnîna leşkerên Qralê Îngilîstanê.

Ew dixwazin baweriya ku gel bi wî aniye pêşîkînin û daxwazên ku Qralîtiya Îngilîstanê



Rejîsor û listikvan Mell Gibson

dixwaze, bi gel bidin kirin. Lê ew ji bo gelê xwe, dixwaze bi mirineke bi rûmet bimire û ji wan re bibe mînaka azadiyê. Heta dema ku serê wî jê bikin jî, dibêjinê ku ew baweriya xwe bi qral bîne û jê merhemetê bixwaze, wê bê azadkirin. Lê ew vê yekê nake, serî jê dikin; peyvek ji devê wî dertê "BIJÎ AZADÎ"

Ev peyv ji gel re dibe slogan û bi artêşa qral re dikevin şerekî pir mezin û qralê Îngilîstanê tîk dibin, digihîjine azadiya xwe.

Wallace ji gelê xwe re di destpêkê de jî wiha digot: "Heke hûn bixwazin bibine xwedî ax, xwedî jin û zarok, pêwîst e hûn azad bin."

Wekî gotina dawî ev dikare bê gotin: Heke hûn dixwazin rewşa gelê xwe a ku niha tê de ye baş fêm bikin, seriyek li vî filmî bixin. Da ku bibînin dek û dolab, fêdî û fût bi çî awayî tîne gerandin, tevgerêk bi çî û bi çî terhî ji hundir ve tê bidestxistin. Û tesîra filmên bi vî rengî çiqas hêzdar e, bibînin

METİN AKSOY



DILBIXWÎN DARA

heye. Ez nikarim gotina dijmin ji ser zimanê xwe hilnîm. Sûcê min çî ye? Dema ku ez di zikê diya xwe de bûm, singûyan ez tirsandim. Tu caran naxwazim çavên min xwîna kuştîyê bibînin, naxwazim şîna dayîkê bibihîsim, naxwazim helbesteke li ser daliqandin û sirgûnê bixwînim.

Belê, dema ku ez di hembêza diya xwe de bûm, di guhên min de ev çîrok dihatin gotin. Ez bi wan çîrokan mezin bûm, hîna jî, ji bîra min neçûne, ez tu caran bawer nakim ku ezê carekê ji bîr bikim. Hîna dawîya çîrokê nehatiye. Bi hemû kes û bûyerên xwe ve berdeham dike. Dramaya me wiha naqede. Trajediya, hîna ji ser sehneyê daneketiye. Her tişt li gorî ku tê xwestin, nameşe. Dilê me dixwaze, em hinekî ji şer dûr bikevin, bixwînin, bilîzin û li stranên hunermend û dengbêjên xwe guhdarî bikin.

Lê belê, ew dev ji me bernadin. Kêra xwe ji nava cegera me nakişînin û ji vexwarina xwîna me tîr nabin. De werin ji xwe re, li vê pênuşê binêrin, ji çavên wê li şûna hêstiran, xwîne diniquite.

Werin, em çavên xwe bi pozê van pênuşan kor bikin/ Bila nebînin, van wêneyan/ Zarokan netirsînin/ Ji gurên Boz/ Ji hovên Çerxa 21'an/ Werin, em li şûna nanê sêlê, kevîran bixwin/ Axê bixwin, axa ku bi agirê bomban dişewite.../ Goştê xwe bixwin/ Di destên me de seriyên mirovan tune ne, ku em pê bilîzin.../ Ev in pênuş/ Ev in, pirtûk/ Ev in, çavên me/ Ji aştîyê re stranên dibêjin.../ Werin/ Piştî me bibînin/ Kul bûye, di bin boxçeya sirgûniyê de...

Xwazî ku ez hozanek bûma, hunermendek bûma, nivîskarek bûma.. Xwazî ez bazek bûma, teyrek bûma... Minê ji nava pençeyên van guran, seriyên hevalên xwe derxistibûya, ezê bibûma axa goristana şehîdan. Lê belê, di her kêliyekê de, guleke nû di dilê min de vedibe, dipîşkive. Di nava rojekê de, gulistanek dixemile. Dîsa jî, tu caran ez nikarim wan seriyên ji bîr bikim. Wê ji pêşiya çavên min neçin, ew wêneyên weşetê, yê ku rûyê dîrokê gemarî dikin. Dîrok ji xwe gemarî bûye. Li dîrokê kesek xwedî dernakeve. Bêxwedî maye, bêcan maye. Dîroka bêxwedî, ne dîroka me ye. Ez nikarim rakevim. Her seriyekî, di nava lepên zarokê guran de, di bîranîna min de, dibe destaneke wekî ya Kela Dimdimê. Hezîkirina min ji wan seriyên re, ji wan simbelên reş re, ji wan bejnên bilind re, dibe mîna hezîkirina Mem û Zînê. Roj bi roj mezin dibe, evîna min dibe destaneke wisa ku, nivîskarên evîne jî nikarin li ser binvîsînin. Ezê çî bikim?

Bila nebêjim bêhêvî ye. Nezan e, kor e nabîne. Bila nebêjin, ditirse, naxwaze dijminê xwe nas bike. Na. Her tiştî ji min bixwazin, lê belê ez nikarim seriyê hevalên xwe di nava pençeyên gurên sor de bibînim.

Ji ber ku nivîsa nisîskarê me Sîrwan Rehîm nekete destê me, me ji dîla wê nivîsa Dilbixwîn Dara weşand. Em ji xwendevanên xwe lêborînhe dixwazin.

## TÎŞK

### Tenê ji bo dilopek xwîn

Di bin her gaveke min de, bombeyek diteqe. Di bin her navekî min de, kuştinek, qetlîamek

# Ew roj

## can dişewitîn

**I**ro, roj, ji rojên din zûtir derketibû û bêhna biharê, xemla dar û beran, xwişîna kaniyê û ya çeman mirov dilxweş dikir. Li nav daristanê jî, hemû giyanewer (candar) hişyar bûbûn; kar û barên xwe dikirin. Moriyana bi lez û bez kujikên genim dikişandin baregahên xwe. Hinek çûçikan jî hêlî-nên xwe ava dikirin, hinek ji wan jî bi mestî stran digotin. Kêvroşk, ji qulên xwe derketibûn û bi şadimanî ji xwe re dileyistin û yarî dikirin. Beq û masiyana jî di nav ava zelal de melevanî dikirin. Bayê hênîk, mîna melodyeke xweş li nav daristanê pêl didane xwe.

Lê, haya wan ji wê kambaxiya mezin ku wê bê serê wan tune bû. Leşkerê Romê agir berdabûn gundên deştê û daristanê. Pêtên agir bilind bûbûn. Ji dükela li nav daristanê, çavan çav nedidîtin. Li hemberî vê rewşa kirêt, hemû giyanewer şaş û metel mabûn.

Milcano bi xwişk û birayên xwe re dileyîst. Dema ku pêtên agir dîtî û bêhna dükelê ket pozê wî, di cihê xwe de rawestiya û guhên xwe bel kirin û bi çavên xwe yên dîndoqî li dora xwe nihêrî. Dît ku agir bi lez û bez ber bi wan ve tê. Pir tirsîya û ber bi dayika xwe ve reviya, ji tirsan hemû canê wî dilerizî. Xwe avêt hembêza dayika xwe û bi dengê kelegirî: "Dayê, ev çi agir e?... Wê me bişewitînin, hewar e hewar e..."

Dayika wî ew hembêz kir û "Netirse berxê min, hûn li virê rawestin, ezê herim derdorê qoleçan bikim, bê ka çi heye, çi nîn e û ezê bêm", got û çû...

Dayika Milcano hinekî jê dûr ketibû hîna, dît ku agir, çarhawirê daristanê girtiye û bi lez pê de diçe, ber bi wan ve tê. Bi şûn de zivirî û hate cem zarokên xwe. Ew bi xwe re rakirin û çûn.

Giyanewerên li wê hêlê hemû komî ser hev bûn, da çareyekê ji xwe re bibînin û ji vî agirî xwe riha (rizgar) bikin. Mar, xezal, hirç, gur, çûçik, kêvroşk, rovî, jûjî, mişk, xiltêkor, morî, mêşên hingivîn, kusî, şêr, piling, beq û masiyana jî di nav ava cihokê de rawestiya-bûn. Hemû şaş mabûn û ji tirsan can, hewar dikirin. Rovî derket serê zinarekî û got:

— Hevalino! Derxistina vî agirî karê leşkerên romê ye. Hûnê bibêjin çima? Berî bi demekê ez li deverê din bûm. Li wê hêlê, daristana ku em lê dijîyan, ji vî daristanê mezintir bû û ew daristan jî bi destê leşkerên romê hate sewi-

tandin. Hemû xwişk û birayên min di wî agirî de şewitîn. Ez bi zorê jê riha bûm û hatim virê.

Pişî vî axaftina rovî, hemû giyanewer li hev kom bûn û di navbera xwe de peyivîn û ramiyan ku wê bi çi awayî ji vî agirî riha bibin. Mar liviya, serê xwe rakir û peyivî:

— Mirov dibêjin ku ji mar kambaxtir çi giyanewer tune ye! Bi çavên xwe bibînin ku ji min kambaxtir, leşkerên romê hene. Bi jehra xwe, bi tenê, kesên ku ziyane bigihînin min ez wan dikujim. Lê, li leşkerên romê binihêrin, me bi cih warê me ve dişewitînin.

Li ser vî axaftina mar, giyanewerên

dît ku agir nêzikî wan bûye û ji nişka ve got: "Gelî hevalan rabin, em lez bikin, an na emê jî mîna çêlikên pisîkê bêne şewitandin."

Rovî: "Rast dibêje, em birevin."

Hirç: "Rast e, lê em bi ku ve herin? Heger em ji daristanê derkevin, vêca wê leşkerên romê me bikujin. Em dernekevin jî, emê bîn şewitandin."

Pisîk: "Min ji bavê xwe bihîstibû ku, şervanên li çiyê tu ziyane nagihînin giyanewerên û dema ku giyanewer xwe biavêjin bextê wan, alikariyê jî dikin û wan diparêzin jî."

Ev axaftina pisîkê, li xweşiya hemûyan çûbû û hêviyê mezînan bi wan re

dilxweşiya xwe, ez bi dû wan ketim.

Xiltê kor: "Himm... ji ber wê çerxa tu cihê wan dizanî."

Milcano: "Belê..."

Mar: "Gelo yê şervan wê min jî biparêzin?!"

Pisîk: "Gelî hevalan tenê, ew ji giyanewerên nebaş hez nakin."

Mar: "Heger wisa be, ji niha û bi şûn de ezê jî alikariya wan bikim. Lê ez zimanê wan nizanîm!"

Rovî (bi ken): "Gelî hevalan, heger ku em bixwazin, em dikarin alikariya şervanên li çiyê bikin. Her wisa (tu mar nihêrî) tu dikarî bi bédengî bike nav leşkerên hov û bi wan vedî. Tu heval hirç, tu jî bi şev, ji nişka ve derkevi, ber leşkerên tirsonek da hemû wan ji tirsan bikevin. Belê tu xwe ji wê biparêzi da te nekujin."

Li ser vî gotinê rovî, giyanewerên pêk ve kenîyan. Milcano li moriyana nihêrî û wisa got: "Hûn jî, bi şev û rojê genim bikişînin, bila şervanên azadiyê birçî nemînin. Da we jî, ji bin zilmê zordariya kedxwaan derxin."

Li ser vî axaftina Milcano, şêr sîngê xwe da pêş û li nav giyanewerên hûrî hûrik çû û hat û xwe li ba kir, pişt re wê ha dest bi axaftinê kir: "Ezê di daristanê bim."

Li ser vî axaftina şêr, Milcano xwe ranegirt bi hêrs xwe avête meydanê got: "Şervanên azadiyê mîrên te jî, holê radikin. Daxwaza wan damezirandina wekhevî û yeksaneyê di navbera hemû giyanewerên de ye. Da kes kesî nexwe, vêca tu dê bi çi rengî bika alikariya wan bikî ku ew jî biparêzin?"

Her wisa şêr hinekî bédeng mabû birastî hinekî jî şerm kir. Bi rengê fediyok wisa got: "Ez daxwazê lêborîne ji we dikim gelî hevalan. Niha û pê de, ezê digel we bixebitîm bi keda xwe jiyana xwe bidomînim."

Milcano: "Bi dûv min de werin gelî hevalan, bi zûtirîn wext em ji vir derkevin an na, emê di nav agir de bimînin û emê bimirin."

Milcano li pêşiyê û hemû giyanewerên daristanê li dû, dane ser riyê sext û dijwar û berê xwe dane çiyê, xwe bigihînin şervanên azadiyê. Li dîsan jî dilê wan bi kul bû, çavê wan paş bû, şûn û warê wan tev hatibû şewitandin. Ev rewşa kambax û meşewerên ji ber çavê wan nedidîn...

**Leşkerê Romê agir berdabûn gundên deştê û daristanê. Pêtên agir bilind bûbûn. Ji dükela li nav daristanê, çavan çav nedidîtin. Li hemberî vî rewşa kirêt, hemû giyanewer şaş û metel mabûn. Milcano bi xwişk û birayên xwe re dileyîst. Dema ku pêtên agir dîtî û bêhna dükelê ket pozê wî, di cihê xwe de rawestiya û guhên xwe bel kirin û bi çavên xwe yên dîndoqî li dora xwe nihêrî. Dît ku agir bi lez û bez ber bi wan ve tê.**

li hev nihêrin, rovî xwe da pêş û got: "Ma ne şer di navbera wan û şervanên kurdan de ye, ji me çi dixwazin?"

Hirç: "Hevalê rovî, dilê xwe negire, ew jî wekî te tirsonek in. Ji tirsan ziyane digihînin her derê."

Mar: "Rast e. Lê ne bi tenê ji tirsan, ji ber ku li hemberî şervanan neçar dibin, ji kerba dilên xwe agir bi gund û daristanan dixin"

Kêvroşk: "Lê yê şervan, çiqasî baş in. Dema ku di nav daristanê de dimeşin, derdorên xwe baş qoleçan dikin û me giyanewerên jî dibînin, lê tu ziyane nagihînin me."

Gur: "Gelî hevalan, şervanên azadiyê kuştina me giyanewerên û birîna daran qedexê kirine."

Pisîk: "Leşkerên romê gund hemû şewitandin, mirov gulebaran kirin û kuştin. Ne bi tenê mirov kuştin; hesper, ga, çêlek û hemû giyanewerên mayî, bi agir kuştin. Sê cewiyên min jî di nav agir de hatin şewitandin."

Di gelî temamkirina axaftina xwe, pisîk giriya. Vê rewşa pisîkê, giyanewerên din xemgîn û kelegirî kir. Di vî navberê de kêvroşkê li dora xwe nihêrî,

çêbû ku, karibin xwe bigihînin çiyê wê ji mirinê riha bibin. Lê ji bo çûna çiyê, kesî rê nedizanî û qonaxa şervanan jî nedizanî. Milcano guhên xwe bel kiribûn û guhdariya mezinan dikir. Zanî ku mezin riyekê ji bo çûna çiyê nabînin, xwe avête holê û mîna lehengan wisa got:

— Ez rîya çûna çiyê dizanim û cihê şervanan jî dizanim.

Li ser vî axaftina Milcano ya ku wekî mizgîniya bihûstê bihîstine, pêk ve li dora kêvroşkê kom bûn. Li ser vî nêzikiya giyanewerên, Milcano hîn bêhtir xwe qure dike.

Hirç: "Heval, heger wisa ye, me bi cem wan."

Şêr: "Ez şahê daristanê me. Lê hîn min şervan nedîtine, ca bibêje li ku dimînin."

Milcano: "Rojekê di dîsa dengê tank û topan dihat. Ez di bin zinarekî de bûm. Min li dora xwe dinihêrî, carekê min dît ku hinek mirov ber bi min ve tên. Li pêşiyê hemûyan keçikek bejn narîn, bi çek û rextan ve rapêçayî dimeşiya. Ez pir tirsîyam. Wan ez dîtîm. Lê têkilî min nebûn, kenîyan û derbas bûn. Ji

# Ji weşanxaneyeyeke nû du kitebên nû

Wêşanvaniya Welatê Rojê (Güneş Ülkesi Yayıncılık) bi du pirtûkên nû dest bi jiyana weşanvaniyê kir. Diriliş Tamamlandı, Rapor Kurtuluştā (Vejin tamam bû, dor hate ser rizgariyê) û Politik Rapor (Rapora Politik).

## Diriliş Tamamlandı Sıra Kurtuluştā

Ertuğrul Kürkçü û Ragıp Duran, di sala 1994'an de li ser navê Rojnameya Özgür Gündemê, bi Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevpeyvîtkê çêkiribûn. Beşek ji wê hevpeyvînê rojnameya Özgür Gündemê de hatibû weşandin, lê, ji ber ku wê demê rojname hatibû girtin, ev hevpeyvîn ji di wê demê de mabû. Piştî demekê din ev hevpeyvîn, di berfanbara 1994'an de di Rapor Weşanên Serxwebûnê de hate weşandin. Vêga jî, ev pirtûk ji aliyê Weşanvaniya Welatê Rojê (Güneş Ülkesi Yayıncılık) ve, bi navê "Diriliş Tamamlandı Sıra Kurtuluştā" (Vejin tamam bû, dor hate ser rizgariyê) derketişberî xwendevanan. Ev pirtûk ji 310 pel pêk hatiye.

Ragıp Duran di berga dawî ya wê pirtûkê de, sedema çêkirina hevpeyvîtkê wiha tîne zimên: "Xwendevanên ku rêmê, mijarê û kurdan nas nakin ji wê wan ve fêmkirina rêxistinê

PKK'ê bi rastî jî, gelekî zehmet e. Di ser de jî mirovên ku li Tirkiyeyê dijîn, li ser PKK'ê, bi yekalî di bin bombardûmana propagandayê de ne. Bi gotinên "PKK veqetînxwaz e! PKK terorîst e! PKK Ermenî ye! û hwd." ne mimkûn e ku mirov rastiya PKK'ê û Öcalan fêm bike. Qebûlkirin an nekirin merhaleya duyemîn e. Lê li Tirkiyeyê gelek însan beriya ku PKK û Öcalan nas bike, red dikin. Agahî tune, lê fikir gelek in. Fikrên bêagahî jî pûç in."

Mirov dikare bibêje ku, bi xwendina wê pirtûkê, pirsên ku di mejiyê xwendevanan de hene, wê ji gelek aliyên ve zêde bibin. Ev pirtûk ji "çiroka" vejinê û rizgariyê behs dike. Di wê pirtûkê de ta-

rix û îro bi hev re tîr pirsîyarkirin. Pêvajoya tunebûnê ji ku û çawa dest pê kir? Di tarîxê de, sazibûna kurdan a civakî û ramiyarî, tîkiliya wan a bi desthilatdaran re çî bû? Politikaya kolekirina desthilatdaran û li dijî wê jî, rewşa gel çî bû û çawa bû?

## Politik Rapor



Di destpêka sala 1995'an de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji Kongreya 5'emîn a PKK'ê re "Politik Rapor" (Rapora Politik) şandibû. Weşanvaniya Welatê Rojê (Güneş Ülkesi Yayıncılık) jî armanca weşandina wê raporê wiha tîne zimên: "PKK'ya ku ev 18 sal e li hemberî sistema desthilatda-

ran şer dike, ji bo eşkerekirina dijberiyên li Rohhilata Navîn roleke girîng dilîze. Êdî hêzeke wisa ye ku ne tenê kurdan û Tirkiyeyê eleqedar dike, hemû dinyayê eleqedar dike. Wê li navenda pêşveçûyînê siyasal û politik cihê xwe girtiye û hêzên din mecbûr mane ku xwe li gorî wê ji nû ve saz bikin. Înkār, redkirin û muhatap negirtina dewletê ya li hemberî PKK'ê rastiyan naguherîne û êdî ev rastî ji aliyê desthilatdaran Tirkiyeyê û dewletên emperyalîstan ve tîr dîtin.

Îro şerê heye û aliyekî şer jî PKK'ê ye. Inex bi xweifadekirina her du aliyên, rastî dikarin derkevin holê. Ji ber wê yekê, me xwe berpirs dît ku em dengê wê jî bigihînin gel û ji lew re em rapora politik a ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji Kongreya 5'emîn a PKK'ê re şandibû, diweşînin."

Ev pirtûk ji 7 beşan û ji 325 rûpelan pêk hatiye. Bi taybetî di wê raporê de, ji destpêkê heta îro çî aloziyên (sorunlar) tîkoşînê derketine, bi awayekî politik û îdeolojîk li ser hatiyê sekinîn. Bi kurta-yî ev pirs ji hev tîr deranîn: Mîlîtan û leşkerê PKK'ê kî ye; jiyana wê/wî çawa ye; awayê bidestxistinê û windakirinê çî ye, divê jiyana çawa be û çawa bê qezenckirin?

AYNUR BOZKURT



## Pirsa rewşenbîriyê û dîtinê bersiva wê

Bêguman, jiyana li ser yek pîvan û weznê nehatiye avakirin. Rastiyeke bi tenê jî tune ye li cîhanê.. Çênabel.. Xweza jî wê qebûl nake.. Tevger û danûstandina civakî, ji dijîtiya hewn û ramanên cur bi cur bi rîkûpêk bûye.. Firehbûn, guhertin û pêşketina xwe dîtîye.. Rast e, pêşketinê bîngeha xwe li ser xerxa rexnegriyê ava kiriye û xwe di nava ba û bahoza serbestî û azadiyê de diyar kiriye. Lê, serbestiyê çawa, azadiyê çawa? Ev her du nixteyên girîng di encama ferdî de, di bûyerên rojane û rewşa welatê Kurdistanê de, derdikevine pêşberî me.

Axaftina min li ser rewşa îro û li ser rewşenbîriya kurdî ye. Dema Konferansa Maastrichê jî ev bûyer hate diyarkirin. Min bi xwe jî qala sê nameyên sala 1926'an û dema Şêx Seîd kir, ku Haco nivîsibû û li ser rewşenbîran radiwestiya, û minak da ku di şoreşa îro de em pêwistî hinek pêkanîna û karûbaran in. Ji ber ku sibe du sibe ev pirsîgîrêka dîrokî wê derbikeve pêşiya me jî.

Ev sedem, dema Xoybûnê jî di encama çewtiya rewşenbîrî de ku xwe di ser komên

xelkê re didîtin, bi devê paşazadeyan hate diki-randin û bû sedema lihevûdîna kişandina demançeyan. Helbet roj wê bê ku xerabî û çewtiya dîrokî bête meydana û ev hesab ji teref gel ve bête xwestin. Rewşenbîrî di nava kurdan de hê nehatiye nasandin û xweş nehatiye wejartin. Li gorî pîvan û wezna îro kesên bi qerewat, tev rewşenbîr in..

Belê, di konferansa Maastrich de min du tişt diyar kirin. Yek: Pêwist e ku em bi dewletî bifikirin. Dudo: Ji bilî serok û rêzanên biyan, me pêwistî bi baweriya rêzan û serdarên kurdan heye. Ji bo ku em karibin bi xweser û bêpalika rewşenbîrên biyan bi xwe, li ser lingên xwe bisekinin.

Li kongreya Yekîtiya Rewşenbîran careke din min ev encam dikirand û got: Me pêwistî bi derxistina berhemana heye.. Bêhtir ji her kesî, em pêwistî nivîsandinê û bersivandina berpirsiya xwe ne. Qedir û qiymeta pênûsê bidinê û pêwistîya pênûsê di warê bikaranînê de binîn cih..

Pişt re, di çend nivîsandinan de min sala 1995'an wekî sala nîqaşê da naskirin û di nava

nivîskar û rewşenbîran de ev bûyer anî meydana. Ji ber ku sala 1995'an ya pîrê nivîskarê kurd, Ehmedê Xanî bû.. Ji bilî wê, di dîroka Kurdistanê de cara yekemîn bû ku kurd xwedî li sazî û avahiyên neteweyî derdiketin û koferansên taybetî çêdibûn.. Mixabin careke din bédengî bû warê me.. Dîroka rewşenbîrên kurd bédengî ye.... Bédengî jî tuneyî ye... Nebûn e... Pûçî ye...

Vê rewşê heya îro jî, ji bilî çend dengên korîk wilo domand. Lê îro, nîqaşê dest pê kiriye. Pêşî Şerefxan Cizîrî dest pê kir û mîna bersivêkê û ragihandineke hewngîrî ya Günay Aslan hate nivîsandin. Mixabin her du nivîsîn jî bi tirkî ne.. Lê, min hewl da bo ez bi zimanê zikmakî tevî wê nîqaşê bibim.

Bi baweriya min, divê ku nav bête danîn.. Nîqaşêke xurt di navbera nivîskarên de bête kirin. Di bin stûna asûman de rastiyeke bi tenê tune ye û di binê konê şîrxalî de çênebe ku rewşenbîrî bikevin rêxetêke hesînî..

Bêguman rewşenbîrî berpirsî ye û berdevkiya jiyane ye.. Lê, pîvan û wezin di rewşa rojê dene.



# Aram û doktor

**A**ram yeno doktorî het. Zerê yî dejeni û xo serê erdi di keno derg. Doktorî embazonê yî pers kerd û va:

- Enî çi werdo?
  - Nono germin
  - Teniya nono germin?
  - E, teniya nono germin.
- Doktorî qerwaşa xo ra vono:

- Şo dermonê çimo biyarî.
  - Feqet nêweş berma û va:
  - Oy doktor, şima bi min yarî kenê.
- Zerê min dejenê.  
Doktorî bi hêrs va:  
- Semê ki roşnê çimonê to zêde biwo û ti çû siya û sipê cêra (cêser) bikê.

MARUF YILMAZ

# Merdimo deyndar

**H**êkki bi çinê bi merdimêko deyndar û zurker bi Merdimo zurker û zurkerî pere yewî zengînî ra deyn kerd wî. Rojêki merdimo zengîn yeno ser ki peronê xo deyndarî ra biwazê. Kêki we yeno kê deyndarî, we kiye di nû. Feqet tutê yî ho verê ocaxi di nûştora Zengîn pers kerd û va:

- Ti sekenê, tuto?
  - Ez deyndaron marena.
  - Qey şar zef yeno kê şima?
  - Qet pers meki.
  - Bayê to hoça?
  - We şû semê ki qulikêki bi qulikêka bîni bîro.
  - Diya to sekana, ha ça?
  - Diya min nonoki hamo werdayiş virazena.
- Weyey û birê to?
- Wayey û birê min bermenê semê ki halê me hol nû?
  - Way leminê, eno çû?
  - Ti zê pilî xeverî donê. Ti apê xo ra rast vajî, bay to hoça di?
  - Eger bay min deynê to ra xelas biwo ez'û rast vajî.
  - Eger ez çîma xu bi cevabê to biyarî, ez'û bay to de ra xelas bikî.
- Tufî va:
- Bayê min şû dewa cêrini semê ki peron deyn biko biyaro bido to. Yani we qulikêki bi.

MARUF YILMAZ

## XELAT...

## XAÇEPIRSA BIXELAT (3)

## XAÇEPIRS

Q	A	Z	Î	M	I	H	Ê	M	E	D
Z	E	X	E	L	Î	Î	R	A		
S	Û	V	D	A	K	A	R			
V	Î	N	M	A	A	V	A			
B	A	E	K	R	A	Z	A	N		
N	A	Ê	R	Î	S					
Ö	N	A	R	Ê	Î					
J	D	A	W	Ê	T					
B	Î	R	N	Î	V	?				

Bersiva Xaçepirsê (1)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 10 kesa belav bikin. Xelata hejmara me ya 3'an kasete. **Şakiro** "Helimcanê" ye **Jêrenot**.


Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



**Kesên ku xelata xaçepirsa l'an qezenc kirine:**  
Î.Temel/Mêrsîn, Û.Seyad/Mêrsîn, Siyar Uğurlu/Edene, Berivan Akboğa/Gebze, İloyê Neper/Stenbol, Hüseyin Naniv/Mêrdîn, Fikret Anda/Amed, Ömer Demir/Mêrsîn Mehmet Özdoğan/Amed, Salih Güler/Batman.

Antik	5	Din	Metod	Bi erêti ez Xwedê-nenas	Gihane-kek	Ya
Kesa di wêne de	5	bi almanî erê	Zend..		Hacet	
	2				Lêvegerin	
Cinav-kek îşarki		Adana di xwarinê de	9		3	
Rojek		Lib, heb		Yezdanek Misirî		irîdyû
		Manzara		Naveke jinan		
Mercek		1		Naveki mêran		
Hindo-Ewrûpî			Maç ramûsan	Çavine		6
				Arif, Hikmet		
Bi zazakî heval				Nebîyan		
Hidrojen						
	Ewro-pium		Xera-beyên li Qersê			
	Osmiyûm					
Mengiraniyek	4		Xawarî-neke bingehin			
Di notayê de sekin	4					
		Cihê bazarê		8		

PEYVA VEŞARÎ





## Mirin jiyanêke nû ye

Destpek rûpel: 8-9

**Y**ekemîn: Rewşa rêzanî ya ku gelê kurd tê de dijî Duyemîn: Negatîviya pêwendiyên gelê kurd û tevgera ramyarî yê bi hunerê re. Hunera kurdî ya teşkîlî, kare bibe hunereke cihanî. Çimkî hunermendê kurd, bi nirxbuhayên bedewî û giyanî pir dewlemend e. Her wiha jî resenî û taybetiyên kelepora kurdî karin bibin alîkar ji hunermendê kurd re. Ji lewre, bêguman hunera teşkîlî kare bihe hunera cihanî.

Ez bawer dikim, hunermend Omer Hemdî di riya xaniyên kerpîçî de li gundên "Hesekê" û li riya sazbandê nayê. Li cihanê navdar bû û pê hat nasîn. Omer Hemdî, qermîçekên çerxê yê li ser rûyên mirovan, çak xuya kirine û her wiha jî kalek li nik dayika xwe rawestiyaye. Ew kiribû nîşana kelepore û welêt.

Nimûneyeke din, hunermend Beşar Alîsa jî, ji çarçoveya neteweperestiyê derketiye, lê hunera wî bi nirxbuhayên kelepore, ciwanî yê kurdî aşlekirî ye. Ew jî, di mirovên ku wî nigar kirine de, baş diyar e. Bi kurdî, hunera kurdî, kare bibe hunera cihanî jî, lê divê ew ji kurdiya resenî, bête wergirtin û bi awayekî ciwan û nûjen bê wênekirin.

*Hûn dikarin çend gotinan li ser hin hunermendên kurd û berhemên wan ji me re bibêjin?*

—Pir hunermend hene, hunermendên pispor in, nû gihane. Wekî nimûne, Omer

Hemdî, Înyet Etar, Beşar Alîsa, Ezîz Gedro, Zuhêr Hesîb û pirên din wekî wan hene.

Ev kom, pêşengên tevgera teşkîlî ne, di hunera kurdî de. Rêwîştên ciwanî yê serbixwe û dûtî ji teqlid û kelkiyê, di hunera wan de zor diyar in. Lê pir hunermendên pispor hene, zû dixwazin navdar bibin û hin jî hene li ber xwe didin ku bibin xwediyê hunereke serbixwe û hin jî hene teqlidê dikin.

Ez dibêjim, hunermendê pispor, ji bo navê xwe, xiyaneyê bi xwe re dike. Ew

li gorî modeyê nîgar dike û ew paşê tî jîbîrînin. Çimkî hunermendê ku di hundirê xwe de dest pê bike, ew bi tenê kare berdewam bike û hunera wî dibe zindî.

Li başûrê Kurdistanê jî Ezîz Selîm, Muhemed Serdar, Aştî Mihdî, Amed Şerif, Baldîn Ehmed hene. Bizava teşkîlî li başûrê Kurdistanê, xwe li ser kel û wariyê dispêre.

Bizava teşkîlî ya kurdî, li Suriyeyê li ser realîstiyê xwe dispêre, lê hinek tabîrî tî de xuya dibin û her wiha jî hin taqekirînên apstraktî û nûjen hene. Ev cudabûn

jî, ji hindikbûn an jî, ji pîrbûna êşa hunermendê kurd tê.


*Rolên dîrokên şaristanî, olî, wêjeyî, mûsikî û felsefî di berhemên we yê hunerî de çî ne?*

—Pêwîst e dîroka kurdî bi bemû aliyên xwe ve bibe mijara hunermend. Di tabloyên min de, rolên kelepore û folklorê jî, ji rolên aliyên din pirtir in, çî di warê xemilandinê kurdî de û çî di warê cil û sema, muzîk û avahiyê de.

Wekî mînak, îsal bi bûneya 300 saliya destana "Mem û Zînê" min portreya Ehmedê Xanî bi rengên kurdî, resenî, wêne kiriye. Di tabloyê de, xemilandinê kurdî diyar e û min ber reşbûnek li pêş portreyê jî eşkere kiriye. Ew jî nîşana bêzariya keça kurd e, yanê bêzariya Zînê ye. Min di tabloyê de li ber xwe daye ku ez êşa naveroka destanê bidime nasîn.

*Gelê kurd li Suriyê ji berê de dijî. Rewşenbîrê bindest e, xwedî kelepore û folklorê. Tevî vê, ew bêmaf e û zordestî lê dibe, çî akama vê li ser hunera we heye?*

—Rewşa gelê kurd sedema xemgîniyê ye, bi êş e, ew di zordestiya neteweyî de dijî. Bêmafê çandê ye, bêguman ez vê sitemkariyê di tabloyên xwe de eşkere dikim, ez kelepore kurdî baş didim xuyakirin. Pirtirîn tabloyên min li ser bermayên kevn, yanê wekî wêneyên xemilandî û rengan, rengê avahiyên gundan, mirovên kurd ên ku bêzarî li ser rûçikên wan diyar dibin û wan mirovan, bêzariyên xwe ji rewşa tengzar birine.



Tabloyeke hunermend Behzat Gedro

### WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER

Gerîndeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMSİZ  
Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu): SAMİ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMİ BATUR  
Berpîrsê Karê Nivîsarî (Yazı İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ  
Berpîrsê Saziyê (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR

Navnîşan (Adres): Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/İstanbul  
Tel-Fax: 0 - 212 - 293 53 19  
Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.  
Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBD)

# Ew muhalîfê Şef bû û wisa jî çû gorê

Bavê Orhan Kemal, A. Kadir Kemalî berê Serekê Mehkemeya Îstiklalê bû pişt re bû bersûcê wê

**Bavê Orhan Kemal, Abdülkadir Kemali (Ögütçü) rojnamevanekî navdar û dijberê wêrek bû ku bi hinceta "bi nivîsên xwe bûye sebebê Serhildana Rojhilat" hatiye girtin û li dadgehên rizgariyê hatiye darizandin. Ew, yek ji pêşengên Koma II. bû ku di Meclîsa I. de li dijî awayê birêveberiya M.Kemal pêk hatibû. Ji ber vê yekê, ji bo hilbijartina Meclîsa II. wekî berendam nehatiye nîşandan û neketiye meclîsê.**



A. Kadir Kemalî, nav yê rûniştîde kesê seyemîn

weşandin. Piştî mirina wî ayînên bibîranîne hatin sazîkirin. Ew mirovekî hepsî bû. Lê kêm xwendevan dizanin ku bavê wî jî, yekî hepsî (mehpûs) bû. Li ser vê yekê jî, hema bibêjin qet nivîs nehatin weşandin.

## Dijberê yaman

Bavê wî dijberê (muhalîfê) dema 1919-25'an bû. Li Dadgehên Rizgariyê (Mehkemeyên Îstiklalê) hatibû darizandin û li bendixaneyên kevirîn ên li Amed û Mazrayê (Elezîzê) razabû; tade û eziyeta rejimê bi malbata xwe re jiyabû. Ew diroka ku, Orhan Kemal dixwe nav rûpelên salnameyên edebiyatê, ansîklopedî û pirtûkên dibistanan, qet behs nake ku bavê wî heşt sal li surgûnê maye û dixwaze ji hiş û bîra mirovan vê yekê bintûtî bide derxistin.

Nivîskarên "pêşverû û çepgir" ku ji dema Mustafa Kemal bi pesindanê behs dikin, çavên xwe ji tiştên ku hatine serê Abdülkadir Kemalî (Ögütçü) yê dijber re, girtine. Tew bi ser de dikarin bibêjin ku di dewra Atatürk de serbestî û azadiya çapemeniyê jî hebûye.

Kêm kes ji ciwanên îro, hîn dibin ku rojnamevanên wê çaxê ji aliyê rejimê ve yeko yeko ji Stenbolê hatine berhevîkirin û piştî rêwîtiyeke dirêj, pêşî ew şandine Amedê û di pey de jî ew şandine Mezrayê; her wiha bi gotinên ku "ew dê bêne daliqandin" xwestine wan biqutîfînin û hem jî wan kesan dixine girtîgehên kevirîn. Cevat Şakir Karağaçlı yê ku bi navê "Halîkarnas Balıkcısı" navdar bûye jî surgûnî Bodromê kirine. Ew jî mehkûmê dadgehên rizgariyê ye û hepsiyê Mazrayê ye.

## Wezîriya dadê ya çar rojan

Bavê Orhan Kemal, Abdülkadir Kemali (Ögütçü) rojnamevanekî navdar û dijberê wêrek bû ku bi hinceta "bi nivîsên xwe bûye sebebê Serhildana Rojhilat" (Mabest serhildana Şêx Seîd e) hatiye girtin û li dadgehên rizgariyê hatiye darizandin. Ew, yek ji pêşengên Koma II. bû ku di Meclîsa I. de li dijî awayê birêveberiya M.Kemal pêk hatibû. Ji ber vê yekê, ji bo hilbijartina Meclîsa II. wekî berendam nehatiye nî-

şandan û neketiye meclîsê.


Abdülkadir Kemali Beg, di sala 1888'an de li navenda Yarpuz Cebelî tarîkê (Osmaniyeya îro) ku niha li ser Edeneyê ye, hate dinyayê. Malbata wî ji Mazrayê hatiye. Ji Eşîreta Canûşaxî ye. Agahî hene ku ew êleke (eşîreteke) kurd e. Wî di sala 1908'an de li Stenbolê tehsila hiqûqê dît. Yek ji organizatîrên İttihat Terakkî yê di nav xwendevanan de bû. Heyranê Talat Paşa ye. Bi fermana Talat Paşa, piştî ku dibistana hiqûqê diqedîne, wî dikin cîgirê dozgerê (mudeyê umûmê) Sêrtê.

## Ji navê rakirina dijberan

Di navbera salên 1919 û 1922'yan de êdî ew ji Kuva-î Milliye yê ye. Çar rojan Wezîrîtiya Dadê (edaletê) kiriye; ji ber ku di çaxa Mustafa Kemal ne amade bûye ji bo Wezîriya Dadê hatiya hilbijartin, navbera her duyan ne xweş bûye. Abdülkadir Kemali Beg, çar roj, bi şûn de wezîfeya xwe terk dîke û dibê dijberê yaman.

Dûmahîk rûpel: 10

İSMAİL GÖLDAŞ



**G**ava ku em navê Orhan Kemal bibêjin, her kes wê di cih de gelek tiştan bi bîr bîne. Wê tavilê xwendevan Qawîşa 72'emîn (72. Koğuş), Li Ser Erden Bîjûn (Bereketli Topraklar Üzerinde), Mala bavê (Baba Evi) û Notirvan Mur-taza (Bekçi Murteza) bînin bîra xwe. Pirtûkên Orhan Kemal, ê ku navê wî zehf hatiye bihîstin, ê ku li hepsan raketiye, ê ku li ser navê wî xelatên edebiyatê hatine dayîn û romannivîs û çî-roknivîsê edeneyî, di dema xortaniya me de qet ji destên em kêm nedibûn. Hemen hemen, min hemû berhemên wî xwendine. Der barê wî de, bi hezaran rûpelên ku tê de pesindan hebûn, hatin